

## Jin di ferqê de ne

Jinên rojhilatê Kurdistanê û Îranê dizanin ku bi qasî nan û avê pêwîstiya wan bi serxwebûnê heye. Jinên rojhilatê Kurdistanê ku bi berxwedêriya Qedemxêra Feylî, bi zanebûna Mestûre Erdelanî, bi wêrekiya Zarifeyan û bi felsefeya jina azad... *Zehra Mohammedzadeh / RÛPEL - 2*



## Ava mezin

Berfa li ser erdê, dema roj hil tê, ew berf jî ber bi danê nîvro ve dihele, helandina berfê jî evîndariyekê dike nav dilê min. Carna ez xwe bi xwe re difikirim "gelo ez du dilî an jî sê û çar dilî me? Gelo hemû keçik di emrê min de jî du dilî ne... *Yildiz Gultekîn / RÛPEL - 14*



## Shakespeare & Company

Şerê cîhanê yê yekem diqede, leşkerên ji laş û ji dil birîndar berê xwe didin malên xwe. Bajarên li ber sekeratê hewl didin xwe derman bikin. Dinya alem cih diguhere, mîna tîcaretê, yekem şerê qerase yê tevahiya kosmosê jî çi qas alemê ji hev dûr xistibe... *Bîlal Ata Aktaş / RÛPEL - 16*


**Rojnameya Heftane**

# xwebûn

www.xwebun.org

30 Kanûn 2019 - 5 Çile 2020

Hejmar: 2

Buha: 4 TL

rojnameyaxwebun@gmail.com


# Bi xêr hatî sala nû



*DI SALA 2019'AN DE* bûyerên girîng li rûpelên dîrokê qeyd bûn û em ketin sala nû. Sala nû li hemû mirovahiyê re pîroz be! Îsal li bakur, rojava, başûr û li rojhilatê Kurdistanê gelek bûyerên girîng pêk hatin. Li her parçeyeke Kurdistanê mijarên cuda derketin pêş...

*RÛPEL - 9*

# Hejmarek mezin ji kurdan bi tirkî dinivîsin

Nivîskarê kurd Firat Cewerî 40 sal in bi pênûsa xwe xizmetê ji edebiyata kurdî re dike û heta niha 40 berhemên wî der çûn. Cewerî têkildarî edebiyatê û nivîsandina kurdî pirsên rojnameya me bersivandin. Cewerî got ku wî her nivîsandiye û wiha axivî: "Xewn û xeyala min ew e ku zimanê kurdî bibe zimanê perwerdeyê û kurd êdî ne ji ber zimanê xwe şerm bikin, lê pê serbilind bibin." Cewerî da zanîn ku nasnavê edebiyatê ziman e, kî bi kîjan zimanî binivîse, edebiyata wan daxilî wî zimanî ye û hejmarek zêde ji kurdan bi tirkî dinivîsin û mirov nikare edebiyata wan têxe nav edebiyata kurdî... *Hevpeyvîna Rizoyê Xerzî / RÛPEL - 4*

### NIVÎSKAR RENGÎN KARDELEN

## Deng beyana hebûnê ye

Nivîskar Rengîn Kardelen got ku qedexekirina pirtûkan tirsa li hemberî zanînê ye û li dijî astengiyan jî gel dixwaze xwe bigihîne wan pirtûkan. Kardelen destnîşan kir ku deng beyana hebûnê û ronahiya mizgîniya cîhana alternatîf e... *RÛPEL - 15*

## Xwestin dayika wan bê berdan

Li navçeya Elbîstanê ya Mereşê rêvebera HDP'ê Elîf Kisa bi hinceta ku pere ji girtiyekî re şandiye hat girtin. Ji bo Kisa û her du kurên wê yên astengdar Îsmaîl (43 ) û Ahmet (41) gelek daxuyanî hatin dayîn û bertek hatin nîşandan. Heta kurên Kisa, Îsmaîl û Ahmet Kisa jî ji bo dayika xwe li gor derfetên xwe daxuyanî dan û li ser medyaya civakî çalakî li dar xistin û xwestin dayika wan bê berdan... *RÛPEL - 3*

## Gundê Qizilquleyê

Ewrên spî û bedew, ên mija serê çiyayê Sîpanê Xelatê hilgirtî, bi ketina gund, me pêşwazî dikin; ji çiyayên Çemçê û Zixçiyê, li dû xwe hîştine û esmanê Qizilqulê yî çik spî dineqişînin. Qasekî bi gundê Qizilquleyê re şa dibin û hêdî hêdî xwe dihejînin, ber bi Elegezê ve. Di sala 1882'yan de 23 malbatên êzidî yên ku ji herêma Eyntabê (Dutaxa Qerekosê) tên, li gundê Qizilqulê bi cih dibin... *RÛPEL - 10*

## Gelo no maslûb Şêx Seîd o?



Heyf ke ser ra 94 serrî wext derbaz bîyo la ma hema zî derheqê Serewedaritişê Milî yê Kurdan yê 1925î de tayê detayanê muhîman nêzanê. Zanayîşê ke ma zanê zî qismê înan yan kêmî yan zî xelet o. Ma zî wazenê nê nuşteyê xo de bala şima biancê yew zanayîşê xeletî ser û hetanî ma dest ra bero raşta ey şima rê îzeh bikerê... *RÛPEL - 13*


**Munevver Karademîr**
**Jin parêzvanên çand û zimanê kurdî ne**
Rûpel - 02

**Roşan Lezgîn**
**Rojeva me Rojava ye**
Rûpel - 05

**Yaşar Eroglu**
**Ziman, nasname û nehabandina kurdan**
Rûpel - 07


## Zrîngê di hejmara nû de cih da xêzkarên amator



Hejmara çaremîn a xêzekovara bi kurdî "Zrîng" derket. Kovar bi zaravayên kurmancî û kirmanckî tê çapkirin û ji 32 rûpelan pêk tê. Zrîngê di berga yekemîn a kovarê de cih daye peyamên ji bo sala nû. Kovar di hejmara 4'emîn de bi dewlemendiya xwe balê dikişîne... *RÛPEL - 15*

## Tifaqa kurdan êdî ferz e

Jinên kurd ku di têkoşîna azadiya Gelê kurd de di her dîrokê de rola xwe lîstine û ji vê têkoşînê re gelek caran pêşengtî kirine. Bi salane jinên kurd ji bo yekitiya neteweyî wek kes, rêxistin, platform û kom di nava tevgerê de ne û jinan destnîşan kirin ku tifaqa kurdan êdî ferz e. Plaftoma Yekitiya Jinên Kurd li Amedê civîn lidarxistin û xalên encamnameya civînê ji raya giştî re aşkera kirin... *RÛPEL - 9*

# Jinên kurd parêzvanên ziman in








**Dayikên kurd ku parêzvanên çand û zimanê kurdî ne divê vê erka xwe ji bîr nekin, zimanê xwe hînî zarokên xwe bikin û bi zarokên xwe re bi kurdî biaxivin**

MUNEWER KARADEMÎR

Her civak bi çand û zimanê xwe tê nasîn û ev herdu hêma bingeha civakê ne. Çanda ku nîşaneya hebûna civakê ye, ji bîr û bawerî û nirxên civakê hemûyan pêk tê. Ji ber wê divê her civak an jî netewe li çand û zimanê xwe xwedî derkeve.

Dema ku çand û zimanê civakê têk biçe ew civak bi xwe jî têk diçe. Çand û ziman mirov di nav civakan xwe de civakî dike, ji civakên din cuda dike û dide nasîn. Çanda ku lê xwedî neyê derketin di pêvajoya dîrokê de dihele û winda dibe. Bi windabûna vê çandê re civak jî hildiweşe û bi demê re xweseriya xwe winda dike. Ji bo parastina vê çandê jî tişta herî girîng ziman e. Ger ku ziman nebe, çand nikare bê parastin û nikare derbasî nifşên nû bibe.

Çand û ziman hêza xwe ji hev digirin, ger ku yek nebe ya din jî nabe. Bi zimanekî qels û ne zelal girîngî û xweşikiya çandê nikare bê pênasekirin. Ji ber vê hêmaya bingehîn a ku çandê biparêze jî ziman e. Parastina ziman girîng e. Ziman nasname ye. Dema zimanê mirov nebe mirov jî tune ye û tune tê hesibandin.

**Girîngiya ziman**

Di serî de divê her kes hînî zimanê xwe yê dayikê bê kirin. Zimanê dayikê pênaseya neteweyan e. Ji bo vê girîngiya parastina zimanê kurdî bêhtir derdikeve pêş. Ji ber ku zimanê kurdî bi salan e hatiye qedexekirin û asîmîlekirin... Divê kurd bi vê hişmendiyê tev bigerin û bizanibin ku zimanê wan nebe wê ew jî nebin.

**Berpirsyariya civakê**

Parastina ziman berpirsiyariya tevahiya civakê ye. Li welatên azad civak bi giştî ji bo parastina zimanê neteweya xwe hewl dide, qadên perwerdeyê vedike û hemû kar û xebatên parastina ziman bi rêk û pêk bi rêya saziyên fermî tên kirin. Lê ji bo neteweya kurd mixabin rewş ne wiha ye; kurdî bi salan hatiye qedexekirin û tenê bi keda jinên kurd bi taybet jî li bakurê Kurdistanê hebûna xwe parastiye.

Lê bi pêşketina teknolojiyê re û ji ber polîtîkayên asîmîlasyonê bandora dayikan a li ser hînkirina ziman her ku diçe lawaz dibe û ziman dikeve xetereyê. Dayikên ku bi salan çand û ziman parastine divê nekevin kêmasiya ku zimanê xwe hînî zarokên xwe nekin. Divê çanda xwe biparêzin û têkoşîna xwe ya hînkirina zimanê dayikê kêm nekin. Ji her demê bêhtir pêdivî bi keda jinan a ji bo parastina zimanê kurdî heye.

**Dayik û ziman**

Ya din, hînkirina dayikan a ziman ji bo zarokan gelek girîng e. Rewş, şert û merc çi dibin bila bibin zaroka ku ji dayika xwe ziman hîn bibe tu caran wî zimanî ji bîr nake, bi çanda xwe mezin dibe, çanda xwe bi pêş ve dixe. Zimanê nû ku tu ji dayika xwe hîn dibî ewqas girîng e ku tu bi kîjan zimanî hîn bibî tu çanda wî zimanî û dîroka wî bêhtir diparêzî. Dayikên kurd ku parêzvanên çand û zimanê kurdî ne divê vê erka xwe ji bîr nekin û zimanê xwe hînî zarokên xwe bikin, bi zarokên xwe re bi kurdî biaxivin. Ev têkoşîna herî bi nirx a ji bo parastina civakê ye û sedema hebûnê ye.




# Mijarên sereke: Yekitî û tundiya zilaman e

NAVENDA NÛÇEYAN

Bi kûrbûna qeyrana şer, aborî, pergalî û hwd. Kurdistan û Rojhilata Navîn di serî de li seranserê cîhanê kaosek tê jiyîn û herî zêde jin û zarok para xwe ji vê kaosê digirin. Bi taybetî di van salên dawîn de ev kaosa heyî hîn kûrtir bû û bi vê ve girêdayî tundî û qetlîama hovane ya li ser jinan derket asteke jor. Lê ruxmê vê yekê li dijî tiştên heyî çalakî, rêxistinbûyîn û dengê jinan jî li her derê bilind bû.

Di nav vê hefteyê dê mijara yekemîn a jinan tundî û çalakiyên li dijî tundiya li ser jinan bû. Jin bi çalakiyên cur bi cur bal kişandin ser tundiya li ser jinan.

**Mijara yekitiyê**

Lê di nav hefteyê de ji derveyî tundiyê di rojeva jinên kurd de rojeva yekitiyê jî hebû. Jinên kurd ji bo pêkanîna yekitiyê bi boneya salvegera Platforma Yekitiya Jinên Kurd ku salek berê hatibû avakirin, li Amedê civiyan. Di civînê de endamên platformê bal kişandin ser pêkanîn û girîngiya yekitiyê. Di axaftinên civînê de hat gotin ku jinên kurd ji yekitiya neteweyî re pêşengiyê dikin û ev bang hat kirin: "Kurdno! Bibin yek. Ger hûn nebin yek, hûn ê herin yek bi yek."

**Çalakiya jinên ciwan ên zanîngehê**

Dîsa xwendekarên jin ên Kampusa Cebecî ya Zanîngeha Enqereye xwestin dansa 'Las Tesîs' bidin pêşandan. Lê polîsan destûr neda û mudaxaleyî xwendekaran kirin. Jinên rastî mudaxaleya polîsan hatin bi dirûşma 'Em bêdeng nabin, em natirsin, em îtaat nakin' berz kirin. Jixwe çend roj beriya çalakiyê jinên ciwan wek hedef hatibûn nîşandin.

**Danezana li dijî tundiyê!**

Di 17'ê kanûnê de li dijî tundiya li ser jinan wezareta dadê danezanek weşand. Lê danezana wezaretê rastî bertekên sazî û dezgehên jinan hat. Li gorî jinan danezan tedbîrên mayînde pêk nayne û di nav xwe de pirsgirêkên cur bi cu dihewîne.

Têkildarî danezanê Weqfa Stargeha Jinan a Mor Çati li ser hesabê xwe yê medyaya civakî nirxandin kir û diyar kir ku piranî xalên giştînameyê tundiya ku li jinan tê kirin vedişêre û têkoşîna ji bo edaletê jî ditepisîne.

Her wiha di nav hefteyê de jinan dozên jinên ku ji aliyê mêran ve hatibûn qetilkirin jî şopandin.



Zehra Mohammedzadeh

# Di ferqa her tiştî de ne

Di sala 2019'an de jin li her derê li ser piyan bûn û jinan çalakiyên cihêreng li dar xistin. Di dawiya salê de jinan ji raperîna gelên Îranê û rojhilatê Kurdistanê re pêşengî kir. Girîng e ku ev raperîn tenê bi bihabûna benzînê ve neyê ravekirin. Jixwe dirûşmên ku hatin berzkirin her tiştî aşkera dikin. Pêşengiya jinên li rojavayê Kurdistanê ji bo jinên Rojhilat jî bû îlham.

Rejîma zilam a Îranê herî zêde jinan dieciqîne, herî zêde jin li hemberî vê rejîmê bi bertek in. Raperîna jinan rejîma Îranê dîn û har kir. Rejîmê hemû hêzen xwe yên tarî xistin dewreyê û êrîşî gel kirin.

Li gor daneyên fermî yên Rêxistina Efûyê, li tevahiya Îranê 304 kes hatine kuştin. Lê belê mixabin li gorî agahiyên ku çavkaniyên herêmî radigihînin hejmara kuştî û birîndaran ji vê yekê pir zêdetir e.

Malbat ji ber tirsa dewletê neçar mane bi derfetên herî kêm birîndarên xwe derman bikin. Jixwe gelek kes hatin girtin, ew xistin girtîgehê û îşkenceyên giran li wan hatin kirin. Piştî raperîna gel jî mal bi mal li pey kesan digerin. Hinek kesan tespît dikin û wan digirin. Birîndar bêyî ku bên dermankirin dibin girtîgehan, îşkence li wan dikin. Hinek birîndar bi îşkenceyê hatin kuştin. Dixwazin kesên ku hatine binçavkirin der barê tiştên ku nekirine de, li xwe mikur bên û belgeyên dirêjî wan dikin, îmze bikin. Bêdengiya heyî dibe sedem ku zext û êrîşên li ser civakê zedetir bibin.

Helbet ên ku herî zêde ji van êrîşan para xwe girtin jî jin bûn. Ji ber ku yên pêşengiya van xwepêşandanan kirin jin bûn. Ji ber vê çendê jî herî zêde jin rastî tund û tûjiya dewletê hatin. Jin bi salan rastî nêzîkatiyên cihêkar, zayendperest û êrîşên mîlîtarîst ên rejîma Îranê hatibin jî, gav paş de neavêtine. Ji ber ku yên herî zêde; ji destpêka şoreşa îslamî ya Îranê heya roja îro, daxwazên wan hatin paşguhkirin jin bûn. Di pêvajoya şoreşê de ku wek kirdeyên şoreşê bûn, piştre di nav çar dîwaran de hatin hepskirin. Jin di ferqa her tiştî de ne. Ji ber vê çendê jî dema çirûskek biçûk jî pê bikeve vê çirûskê ji bo xwe wek hinceta bilindkirina têkoşînê dibînin.

Jixwe di pêvajoya beriya wê de jî gelek parêzvanên mafê mirovan, aktîvîstên jin û parêzvanên hawirdorê yên wek Nesrîn Stûde, Zeyneb Celaliyan, Atena Dayîmî, Gulrox Îrayî, Hengame Şehîdî, Nazenîn Zagirî û Mojgan Kawûsî dîsa gelek jinên ku em navên wan niha nikarin li vir rêz bikin, tenê ji ber daxwaza maf û wekheviyê û guherîna bingehîn hatin girtin û bi cezayên giran hatin darizandin.

Bêguman ne tenê jin, civaka Îranê jixwe di bin dorpêçek piralî de ye. Civak tê serkutkirin, di warê çandî û nirxan de heya dawî destwerdanek kûr û hov a li ser gotinê ye. Civak ji rastiya xwe tê dûrxistin. Ev yek jî polîtîkayek rejîmê ya taybet e. Dema siyaset û aboriya wan têk biçe û hêza xwe ya heyî jî ji bo destverdana derve bikar bîne, wê demê jî hewce bi mîjûlkirina civakê bi tiştên cihê dibîne. Ji bo wan tişta girîng destwerdana navxweyî ya li ser civakê ye. Hewl dide civakê bi vî rengî ji bûyer û rewşa welêt dûr bigire.

Jinên rojhilatê Kurdistanê û Îranê dizanin ku bi qasî nan û avê pêwîstiya wan bi serxwebûnê heye. Jinên rojhilatê Kurdistanê ku bi berxwedêriya Qedemxêra Feylî, bi zanebûna Mestûre Erdelanî, bi wêrekiya Zarifeyan û bi felsefeya jina azad bi aşkera daxwazên xwe tînin ziman û guhertinên bingehîn dixwazin.

# Çerxa zaliman her car nagere

Ev dişibe înkarkirina ayeta Quranê ya ji aliyê sofiyekî ve. Çiqas ku înkarkirina ayetê ya sofiyekî sosret e, hesibandina sûc a şandina pere ya ji bo girtiyek jî ewqas sosret e

QEDRÎ ESEN

Destpêka meha kanûnê, li navçeya Elbistanê ya Mereşê, li dijî endam û rêveberên HDP'ê yên navçeyê operasyoneke siyasî hat lidarxistin. Di vê operasyonê de 3 kes bi hinceta ku "alîkariya rêxistinê" kirine hatibûn binçavkirin û paşê jî hatibûn girtin. Ji van her sê kesan Elîf û Alî Kisa hevjînên hev bûn.

Ji ber "rast ragihandina" çapemeniya alîgir, piraniya raya giştî ya Tirkiyeyê binçavkirin û girtina van hevjînan weke derbeke mezin a li dijî PKK'ê bihîst! Lê kurdan û kesên ku bi doza kurdan re mijûl dibin, ev weke binçavkirin û girtina bav û dayika 2 kesên astengdar bihîst.

**Derba li dijî mirovahiyê**

Belê derba mezin a li dijî PKK'ê ku di çapameniya alîgir de hat ragihandin, di rastiyê de derba mezin a li dijî mirovahiyê bû. Elîf Kisa û hevjînê wê Alî Kisa ku piştî çend rojan li ser îtîraza rêveberên HDP'ê yên Elbistanê bi şertê kontrola edlî hat berdan, ji ber xebatên xwe yên siyasî û hestên mirovî hatin binçavkirin û girtin.

Sedema girtina Elîf Kisa ku weke "alîkariya rêxistinê" derbasî belgeyên hiqûqê bûye, şandina pere ya ji bo girtiyekî siyasî ye. Kisa ji ber ku li gorî qanûnên Tirkiyeyê pere ji girtiyekî siyasî re şandiye, ev nêzî mehekê ye bi awayekî nehiqûqî girtî ye.

Ji bo Kisa û her dû kurên wê yên astengdar Îsmaîl (43) û Ahmet (41) gelek daxuyanî hatin dayîn û bertek hatin nîşandan. Heta kurên Kisa, Îsmaîl û Ahmet Kisa jî ji bo dayika xwe li gorî derfetên xwe daxuyanî dan û li ser medyaya civakî çalakî li dar xistin. Tenê daxwazek wan hebû ev jî bi gotina wan, 'Em ji dayika xwe pir hez dikin, bila dayika me bê berdan'.

**Qet xwe nakin xwedî**

Muktedîrên Tirkiyeyê ku her roj li bernameyan dersên mirovahiyê didin û qala zilm û neheqiyê dikin, qet xwe li van daxuyanî û çalakiyan nekirin xwedî. Ji emelê wan diyar e ku wê xwe qet jî xwe nekin xwedî. Heke xwe kiribana xwedî jixwe tiştek wiha nedikirin û ji ber hesteke mirovî dayika kesên astengdar ji nav wan dernedixistin û nedişandin girtîgehê.



Heta niha li tu derî nehatiye dîtin û bihîstin ku mirov, ji ber şandina pere ya ji bo girtiyan hatine girtin. Ev yek cara yekemîn li Elbistanê hat dîtin. Ev dişibe înkarkirina ayeta Quranê ya ji aliyê sofiyekî ve. Çiqas ku înkarkirina ayetê ya sofiyekî sosret e, hesibandina sûc a şandina pere ya ji bo girtiyek jî ewqas sosret e.

Hem hûn ê di zagonên xwe de rê bidin vê yekê hem jî vê yekê sûc bihesibînin. Ma ev qet dibe? Temam qebûl hûn zilimkar in, di vê mijarê de kes di ser we de tune ye. Lê ji bîr nekin çerxa zaliman her car nagere.

## Leşkeran bi ser gundan de girt û jin derb kirin



NAVENDA NÛÇEYAN

Li bakurê Kurdistanê operasyonên leşkerî tên kirin. Di çarçoveya van operasyonan de leşker bi ser gundan de digirin û tehdê li gundiyan dikin. Di 21'ê kanûnê de leşker û tîmên taybet, bi ser mezraya Bûrmataş a girêdayî gundê Hasanova ya navçeya Kanîreşê ya Çewlikê de girtin.

Di bin navê lêgerînê de hemû amûrên li malan ji hev xistin û xesar dan wan. Leşkerên ku di lêgerînan de tiştekî nedîtin, nav mala welatiyê bi navê Zekî Sayak (85) ku cezayê wî hatibû erêkirin, bi hinceta ku "kamp heye" kolan. Dema jinan bertek nîşanî vê yekê da, leşkeran bi tundî û heqaretê li wan kirin û li wan dan. Gundiyan xwest ku tiştên ku li gund pêk hatine di cih bên lêkolînkirin û ji bo vê yekê bang li rêxistinên mafên mirovan û parlamenteran kirin.

**Piraniya gundiyan binçav kirin**

Di 24'ê kanûnê de leşker li navçeya Berwariyê ya Sêrtê jî bi ser mezraya Umyanis de girtin û bi angaştên "propaganda rêxistinê kirine" û "kesan tevlî rêxistinê dikin" 19 kes binçav kirin. Ji ber ku piraniya gundiyan hatin binçavkirin, welatiyên astengdar û sewal bêxwedî man.

Leşkerên tirk li sêgoşeya navçeyên Licê, Farqîn û Pasûrê yên Amedê jî derketin operasyonê. Leşkeran di vê operasyonê de bi ser gundan de girtin û lêgerîn kirin. Her wiha leşkeran di çarçoveya operasyonê de 19 şikeftên dîrokî yên li her sê navçeyan bi çekên giran hilweşandin.

## Qurbaniyên Roboskê hatin bibîranîn

NAVENDA NÛÇEYAN

Di 28'ê Kanûna 2011'an li gundê Roboskê yê navçeya Qilebanê ya Şirnexê, balafirên Hêzên Çekdar ên Tirkiyeyê (TSK) bombe li roboskiyan barandin û 19 jê zarok 34 welatî qetil kirin. Li gel ku bi ser bûyerê re 8 sal derbas bûn jî heta niha ne berpisyarek hatiye darizandin û ne jî kes hatiye girtin.

Dema ku bûyer pêk hat, serokwezîrê demê serokkomar Recep Tayyîp Erdogan gotibû ku wê destûr nedin bûyer di qorîdorên Enqereyê de winda bibe. Erdogan paşê van gotinên xwe daqurtand û kesên ku ev bûyer bi destê wan pêk hatibû xelat kir û di leşkeriyê de payeyên bilind da wan.

Bi munasebata salvegera komkujiyê, di 28'ê Kanûnê de Hevseroka KCD'ê Leyla Guven, Hevserokê HDP'ê Sezaî Temellî, Hevserokên Giştî yên DBP'ê Salîha Aydenîz Keskîn Bayindir jî di nav de gelek kes berê xwe dan Roboskê û qurbaniyên komkujiyê li ser gorên wan bi bîr anîn.

**Kurd hê jî tên qetilkirin**

Li ser goristanê parlamenterê berê yê HDP'ê Ferhat Encu ku di komkujiyê de birayekî wî jî jiyana xwe ji dest dabû, axaftinek kir. Encu sozên ku ji bo ronîkirina komkujiyê ji hêla rayedaran ve hatibûn dayîn, bi bîr xist û diyar kir ku yek soz jî bi cih nehatiye û hê jî kurd tên qetilkirin.

Desthilata AKP'ê ku wê demê qaşo sozên ronîkirina komkujiyê dabûn û hin raporan amade kiribûn, ji bo salvegera komkujiyê daxuyaniyek jî neda.



## Dorpêçê Cîhan Can pelçiqand

Polîsên Hêzên Çevîk ku ji 20'ê mijdara 2018'an de li pêş avahiya HDP'ê ya Amedê barîkat danîne û dorpêç kirine, ciwanê 33 salî yê Endezyarê Înşaetê Cihan Can (33) qetil kirin. Maşîna polîsan li pêş avahiya HDP'ê ya Amedê li Can qelibî û ew pelçiqand. Di bûyerê de Can jiyana xwe ji dest da. Di dîmenên kamerayê de jî hat dîtin ku dema Can, di ser kolanê re derbas dibe, maşîna polîsan li Can diqelibe û di bin tekerê xwe de dipelçiqîne. Li gel ku ajokar Can ferq dike ku Can li pêş maşîneyê ye jî bêyî ku raweste maşîneyê li Can diqelibîne û derbas dibe. Piştî welatiyên der dorê ajokar hişyar dikin ew radiweste. Cenazeyê Can, li Goristana Yenîkoyê hat veşartin. Malbata Can şîna xwe li Mala Şînê ya Hevêdiyan a li navçeya Rezanê danî. ***AMED***

## Cenazeyê 2 penaberan hat dîtin

Li gundê Kaşkol ê navçeya Elbakê ya Wanê, di 24-25'ê kanûnde de ser sînorê Îranê cenazeyê 2 penaberan hat dîtin. Hat ragihandin ku her du penaber jî dema ku xwestine ji Îranê derbasî Wanê bibin qefilîne û jiyana xwe ji dest dane. Cenazeyên her du penaberan jî ji bo karê otopsiye rakirin Saziya Tipa Edlî ya Wanê (TDK). ***WAN***

## Kaneke komirê rûxiya û kesek mir

Di 24'ê kanûnê de li kaneke komirê ya li herêma çiyayê Cûdî ya Şirnexê hezaz pêk hat. Karkerê bi navê Hasan Înal (40) di bin hezazê de ma û roja piştî hezazê cenazeyê wî ji binî hezazê hat derxistin. Cenazeyê Înal ji bo otopsiyê rakirin Nexweşxaneya Dewletê ya Şirnexê û piştî karê otopsiyê li Bajaroka Gundikê Melê hat veşartin. ***ŞIRNEX***

## Li gola Wanê 7 penaber xeniqîn

Di 26'ê kanûnê de kelekeke ku komek penaber tê de bûn, di gola Wanê de noqî avê bû û 7 penaber xeniqîn. Walîtiya Wanê ragihand ku penaber xwestine ji Wanê derbasî Mûşê bibin û keleka wan nêzîkî navçeya Elcewazê ya Bedlîsê noqî avê bûye. Li gorî daxuyaniya walîtiyê koma penaberan ji Pakistan, Bengladeş û Afganistanê bûn. ***WAN***

## Tirkiyeyê 33 kurd radestî Îranê kirin

Tirkiyeyê, di 27'ê kanûnê de yek jê rojnameger bi giştî 33 welatiyên rojhilatê Kurdistanê ku ji ber zextên rejîma Îranê derbasî bakurê Kurdistanê bûbûn, radestî Îranê kirin. Rêveberiya Koç û Koçberan a Tirkiyeyê têkildarî mijarê daxuaniyek da û ragihand ku welatiyên mijara gotinê ji Deriyê Sînor ê Gurbulaxê yê li navçeya Bazîdê ya Agiriyê re radestî Îranê kirine. ***AGIRÎ***

## Polîsan li Amedê îşkence li B.Y. kir

Polîsan, di 25'ê kanûnê de ciwanê bi navê B.Y. li Amedê binçav kirin û di bin çavan de îşkenceyeke giran lê kirin. Polîsan ji ber îşkenceya ku kiribûn, bi saetan destûr nedan ku parêzer bi B.Y. re hevdîtinê pêk bînin û gef li parêzeran xwarin. Parêzeran piştî bi çend saetan bi B.Y. re hevdîtin kirin û îşkenceya ku lê hatibû kirin bi wêneyan belge kirin. ***AMED***

## Nivîsandina bi kurdî bi serê xwe, li dijî siyaseta asîmîlasyonê ye

# Nasnavê edebiyatê ziman e

→ RIZOYÊ XERZÎ


Kî bi kîjan zimanî binivîse, edebiyata wan daxilî wî zimanî ye. Hejmarek mezin ji kurdan bi tirkî dinivîsin. Ez nabêjim ew mirovên xerab in an ne nivîskarên baş in, lê di kategorîzekirina edebiyata wan de ez nikarim edebiyata wan têxim nav edebiyata kurdî

**FIRAT CEWERÎ kî ye?**



Firat Cewerî di sala 1959'an de li Nisêbîna Mêrdînê hatiye dinyayê. Nivîskar, wergêr û rojnamevanê kurd di ciwaniya xwe de wêjeya kurdî bala wî kişandiye û li Nisêbînê dest bi karê wêjeyî kiriye. Di salên 1980'yî de li Swêdê bi cih bûye û ji wê demê de cihê xwe di nav gelek xebatên wêjeyî de girtiye. Cewerî li Swêdê edîtoriya kovara wêjeyî ya bi navê Nûdem dikir û li kêleka wê gelek berhemên cihanî wekî yên John Steinbeck, Anton Çehov, Dostoyevski, Astrid Lindgren, Hemming Mankell û Yaşar Kemal wergerandine zimanê kurdî.

*Nivîskar û rojnamevan Firat Cewerî, cara pêşî bi riya kovara Nûdemê ku li Swêdê dihate çapkirin, min navê wî bihîst. Nûdem di nav 10 salan de 40 hejmarên xwe gihandin ber destê xwendevanan. Heta niha derdora 40 berhemên wî hatine çapkirin. Me xwest ku di çilsaliya nivîskariya wî de , bi çend pirsan, em serbûriya van 40 salên bi liv û tevger ji Firat Cewerî bipirsin û bi xwendevanên rojnameya Xwebûnê re parvebikin.*



***Qedera gelek kedkarên zimanê kurdî û berhemên wan li mişextî û xerîbiyê dest pê kiriye. Tu dikarî ji kerema xwe, di vî warî de hinekî behsa çîroka xwe bikî?***

Ez di salên xwe yên naşîtiyê de ketim nav siyasetê. Piştî ez ketim nav siyasetê, digel xwendina kitêbên îdeolojîk, min dest bi xwendina şairên mîna Mayakovskî, Lorca, Nerûda û hwd kir. Min hew dît qelem di destê min de ye û ez dinivîsim. Min bi tirkî dixwend lê min bi kurdî dinivîsand. Ya min wek protestoyekê bû, li dijî neheqî û siyaseta înkarê serîhildanek bû.

Min di hijdehsaliya xwe de defterek helbest nivîsandibû. Lê ji ber ku qedexe bû, min ew deftera xwe di deverên cihê de vedişart. Devera herî ewle paşila diya min bû. Gava esker û polîsan ji nişkê ve digirtin ser taxê, an sermalê, min ew defter divirvirand ser diya xwe, wê jî hema dadidayê û di paşila xwe de vedişart. Min rebena diya xwe jî kiribû şirîka tirsa xwe. Gava salan xwe nêzîkî 1980'yî kir û dengê teperepa postalên leşkeran hat, ez li riyekê geriyam ku welêt biterikînim.Temenê min jî gihiştibû nozdehan. Min di ser sînoran re xwe bi hezar zehmetiyan gihand Swêdê. Lê, berî ez derkevim, ji bo ez bikaribim helbestên xwe jî bi xwe re derxim, min hemû deftera xwe ji ber kir, sernavên helbestan di binê piziya xwe de veşart û xwe gihand Swêdê. Hema ku ez gihiştim Swêdê min tavilê ji xwe re deqtîloyek kirî û ez rûniştim, min hemû helbestên xwe nivîsandin û di eynî salê de bi navê 'Êrîş Dikin' da çapê. Ew sal ev sal e ez di wê rêwîtiyê de dimeşim.

***Xewn û xeyalên Cewerî der barê xebatên zimanê kurdî de çi bûn û kîjan xewnên te çûn serî kîjan nîvco man?***

Gava ez niha li salên xwe yên buhurî vedigerim, ez dibînim ji roja ku min gava xwe avêtiye Swêdê ez vala nesekinîme. Min her nivîsandiye. Di warê kovargerî, çapemenî û nivîskariyê de çi ji min hatiye min kiriye. Ya rastî, bila nebe wek pesnekî, min heta niha çi dabe ber xwe, min li gora taqeta xwe biriye serî. Lê xewn û xeyala min ew e ku zimanê kurdî bibe zimanê perwerdê û kurd êdî ne ji ber zimanê xwe şerm bikin, lê ji ber serbilind bibin.

***Di salên dawî de nivîskarên kurd ji helbest û çîrokan bêtir berê xwe dane romanê, li gorî, we romana kurdî di kîjan ast û qonaxê de ye?***

Di gelek kultur û zimanan de, ji bo gelek nivîskaran helbest destpêka nivîsê ye. Ew bi helbestê dest pê dikin û paşê derbasî şaxên din ên edebiyatê dibin. Ev yek li ba me jî welê ye. Ez bala xwe didimê ku gelek keç û xortên me dixwazin di cîhana romanê de bilivin. Ew bi islûb û awayên cihê dinivîsin. Lê serwext in. Haya wan ji edebiyata dinyayê heye. Ew bi zimanekî qedexe, dixwazin edebiyateke ku sînoran gav dike û ber bi gerdûnîbûnê ve dikeve rê biafirînin.

***Piştî 40 salan kedkariya di xebatên zimanê kurdî de çi xwezî û hêviyên te hene, yanî heke Firat Cewerî niha vegeriya salên 90'î wê çi kiriba, wê çi nekiriba?***

Min di salên salên 90'î de dest bi derxistina kovareke edebî Nûdemê kir. Min xwest ez nivîskarên kurd ên seranserî dinyayê di binê sîwanekê de bicivînim û pê hewl bidim ji bingeha edebiyata kurdî ya modern re du keviran deynim ser hev. Ez dibêjim, heke ez îro li salên 90'î vegeriyama min ê dîsa bixwesta kovareke bi rengê Nûdemê derxista. Min ê bixwesta jiyana xwe têxim oxira ziman û edebiyata kurdî. Her ku min du gotin li kurdî zêde kirine ez ew çend pê dilşa bûme. Mijûlbûna min a bi kurdî bûye bingeha jiyana min û çavkaniya dil şahiya min.

***Te kar û xebatên ziman di warên cuda de kirine tu bêtir xwe di kîjan berhemên xwe de dibînî, an jî bi gotineke din te kela xwe di kîjan berhemê de hênik kir?***

Roman bû rawestgeha min a dawî. Loma ez bêtir xwe di romanê de dibînim. Her romanek ji bo min dibe destpêka jiyaneke nû. Ez ji bo avakirina romanekê, cîhanekê jî ava dikim. Ez mirovên nû derdixim, nav li wan dikim, qederekê li wan bar dikim û wan dixim tevgerê. Ez carina dibim yek ji karakterên romanên xwe û bi wan re tevdigerim. Ez bi wan re didim û distînim, bi wan re dipeyivim, bi wan re radizêm, bi wan re radibim. Ew dibin kesên min ên herî nêzîk. Loma, gava ez romanekê diqedînim û ji weşanxanê re dişînim, êdî ew karakter jî ji min bi dûr dikevin, ji jiyana min derdikevin, difirin û diçin. Bawer bike ez gelek caran hizna wan dikişînim. Lê, piştî demekê ez dest bi avakirina hin karakterên nû dikim û hêdî hêdî hogirî wan dibim. Piştî tam bi wan re dibim yek û roman ber bi weşanxaneyê dikeve rê, ew jî ji jiyana min derdikevin. Jiyan bi vî awayî berdewam dike...

***Çend berhemên we yên bi zimanê tirkî jî hene, çima te hewcedarî dît bi zimanekî din binivîsî?***

Min tu carî edebiyat bi tirkî nenivîsandiye. Gava zimanê kurdî bi her awayî qedexe bû, min nedixwest û destûr nedida ku berhemên min wergerin tirkî jî. Piştî ew qedexeya li ser zimanê kurdî hinekî sivik bû, min jî destûr da û heta niha heft kitêbên min wergeriyane tirkî

***Li gorî nêrîna min nivîskarên kurd ên ku berhemên xwe bi zimanekî din dinivîsin ew tu sûdê nadin pirtûkxaneya kurdî û ew berhem dibin malê zimanê ku pê hatiye nivîsandin, hûn çawa şîrove dikin gelo?***

Nasnavê edebiyatê ziman e, kî bi kîjan zimanî binivîse, edebiyata wan daxilî wî zimanî ye. Hejmarek mezin ji kurdan bi tirkî dinivîsin. Ez nabêjim ew mirovên xerab in an ne nivîskrên baş in, lê di kategorîzekirina edebiyata wan de ez nikarim edebiyata wan têxim nav edebiyata kurdî. Îro, gelek kurd êdî ne tenê bi tirkî, ew bi gelek zimanên dinyayê dinivîsin. Reaksiyona me ya li hemberî tirkî ew e ku zimanekî serdestî li me û zimanê me kiriye, bi zorê bûye zimanê me, loma em li hemberî wî dilşikestî ne.

***Di demên dawîn de ji bo parastina ziman û çandê platform tên avakirin. Hejmara ragihandinên ku bi kurdî weşanê dikin zêde ne û di qada civakî de xwe gihandina kesan rihetir bûye. Li gorî te astengiya li hemberî zimanê kurdî ya herî mezin çi ye?***

Bêguman ev platformên ku ji bo parastina zimanê kurdî tên avakirin pir hêja û hewce ne. Yek jê, ew dîwarê neyartiyê ji nav kurdan radibe, kurdên ku di warê siyasî de mîna hev nafikirin tên ba hev û hêviyekê dide civata me ya ku di nav bêhêvîtiyê de fetisî ye. Ev gav hemû baş in. Lê divê ev gav berfirehtir bibin, bi awayekî dîplomatîk têkeve qada navneteweyî jî û di doza perwerdeya bi zimanê kurdî de bi cih bibe. Astengiya li ber zimanê kurdî ew e ku statuyeke zimanê kurdî tune. Zimanê kurdî hê jî tenê zimanê malê ye, heta li gelek malan jî cih lê teng bûye. Divê zimanê kurdî bibe zimanê perwerdeyê, bibe zimanekî fermî. Li hemû saziyan, li hemû dezgehan kurdî wek zimanekî fermî hebe...

***Ji bo pêşîgirtina li windabûna zimanê kurdî divê çi were kirin di vî warî de çi dikeve ser milê nivîskarên kurd û her wiha hemû kurdan?***

Berî her tiştî divê nivîskar û siyasetvanên kurdan li hemberî hev bi tolerans bin, neyartiyê ji nav xwe rakin û bi dostanî nêzîkî hev bibin. Bila wek hev nefikirin, lê ji bo bidestxistina mafên xwe divê bi hev re tevbigerin. Ev yek hem ji bo pêşîgirtina li wendabûna zimanê kurdî, hem jî ji bo bidestxistina mafên perwerdeya bi zimanê kurdî. Herçî nivîskarên kurd e, ji xwe tiştê ketiye ser milên wan dikin, digel hemû zehmetiyan bi zimanê xwe dinivîsin. Nivîsandina bi kurdî bi serê xwe li dijî siyaseta asîmîlasyonê berxwedan e. Lê nivîskarên kurd dikarin ji bo bidestxistina mafên perwerdeya bi zimanê kurdî lobiyan ava bikin. Em carinan hin lobiyan ava dikin, lê cihoka me riya gola xwe nabîne û heta ku rê dibîne dimiçiqe. Loma, divê siyasetvanên kurdan, bi awayekî pir cidî li ser girîngiya zimanê kurdî rawestin. Divê siyasetvanên kurdan daxwaza zimanê kurdî tenê di sloganan de nehêlin û bikin yek ji armancên xwe yên sereke. Nêrîn û îdeolojiyên wan çi dibin bila bibin, divê ew bikaribin ji bo kurdî werin ba hev û li dor kurdiyê bicivin.

Wek rojname me nû dest bi weşana heftane kir. Ger ji bo me pêşniyarên te hebin dikarî bikî û em peyamên te dawîn werbigirin.

Mixabin min hê rojnameya we nedîtiye, min tenê nûçeya wê bihîstiye. Nûçeya wê mîna mizgîniyeke mezin gihişt bin. Ez ji mêj ve li benda nûçeyeke weha bûm. Bi hêviya ku wê temenekî dirêj bijî.

***Ji bo hevpeyvînê em spas dikin.***



# Rojev Rojava ye

Roşan Lezgîn

Li Bakur panzdeh salên pêşîn ên salên 2000'î ji bo ziman (kurmancî û kirdî) û edebîyata me demeka zêrrîn bû. Lê ji sala 2015'î û vir de şikestineka gelek kûr çêbû û hîn jî dewam dike. Di rewşeke wisa de derketina rojnameyeka kurdî gaveke muhîm e. Ji vê çendê ez dibêjim rojnameya Xwebûn li ser xêrê be.

Piştî ku hejmara pêşîn derket, ji rojnameyê li min gerîyan, xwestin ez jî binivîsim. Ji ber ku gelek serborîyên tahl di ber çavê min re bihurîn lewma dema min got "Ser çavan re" bêhemd gihaneka "lêêê" jî pê re wisa dirêj ji devê min derket!

Çi tahl an şîrin ferq nake, serborî tecrube ne; tarîx in. Em dema li diyarde yan bûyerekê dinihêrin, dema em roja xwe plan dikin, divê em bûyerên duhî (tarîxê) bînin bîra xwe. Çi dema hewce dike eger em bûyerên bihurî neyînin bîra xwe, em korfam dibin! Ev ji bo miletan jî wisa ye. Miletê ku tarîxa xwe nizanibe, serborîyan wek tecrube di bîra xwe de mihafeze neke û di eyneya rabirdûyê de li pêşîya xwe nenihêre bila xwe ji mirîyan hesab bike.

Em nimûneyeke wisa bidin. Li Spanyayê wek edet "şerê gayan" heye. Gayî baş xwedî dikin û ji nişka ve berdidin aresayê (arena). Matador (kesê ku bi gayî re şer dike) di destê wî de çarşeveka sor, şûr li ber, li aresayê amade ye. Berê li meydanê gayî baş diwestîne, dû re bi derbên şûrî gayî dikuje.




Matador ji bo vî karî perwerde bûye, tecrubeyên wî gelek in; hem îdman kiriye da ku wicûdê wî jidandî be hem derheqê şerê bi gayan re gelek tişt dîtine, xwendine. Lewma dema ku bi gayî re şer dike, hemî bîrhatin jê re dibin tecrube; bi fen û fûtan, bi şeytanî şerê gayî dike. Temaşekar ji dîtina manewrayên hostayane yên matadorî zewq digirin. Lêbêle gayê reben bêtecrube ye; ev cara pêşîn e ku dikeve şerekî wisa xeşim. Pahra korfaman jî şikestin e!

Eger ga jî mînanî matadorî xwedî tecrube bûya, ji tarîxa vî şerî agahdar bûya, yaxme bû ku matador bikaribûya ewçend bi hêsanî stûyê wî bişikanda. A tarîx ev e; hem ji bo kesan hem ji bo miletan yekûna serborî û ceribînan e. Lewma dema min got "lêêê" tecrubeyan ez hişyar kiribûm! Serborîya rojnameya Azadîya Welatî, tecrubeya danîna "Komela Nivîskarên Kurd" û hîn gelek bûyerên din hatin bîra min. Bo nimûne, Azadîya Welat berê kurdane bû, gelek kesan tê de dinivîsî. Lê paşê dagerîya bû şûrekî îdeolojîyê! Eger hûn tenê bala xwe bidin manşetên dema dawîn ên Azadîya Welatî hûn ê têbigihên ez çi dibêjim.

Bi rastî serborîya "Komeleya Nivîskarên Kurd" jî wisa bû. Berê sazîyeke kurdewar bû, gelek nivîskarên kurdperwer wek damezrîner tê de bûn. Lê paşê, eynî serborîya Azadîya Welatî hate serî.

Ji vê çendê ez ji dil hêvî dikim ku rojnameya Xwebûn di xizmeta kurdayetîyê de be; bi xeteka stûr platformeka azad a parastin, xurtkirin û pêşvebirina nasnameya kurdbûnê be; sedayeka sade û aqilane ya entelejesîya kurdî be; xizmeta kamilkirina netewebûna kurdan bike. Eger wisa be, ez ê hem bi kurmancîya gewr hem bi kirdîya me ya berîn binivîsim. Fikrê xwe ji bo xizmeta berjewendîyên bilind ên miletê xwe tê de îfade bikim. Na, eger nebû, ew di rêya xwe re em di rêya xwe re.

Ji ber ku di nivîsa Edîtor de dibêjin "yekîtîya neteweyî ku niha di rojeva kurdan de ji bo me rêgez" e, ez dixwazim vê bibêjim. Yekîtîya Neteweyî tiştekî wisa nîne ku tenê demekê (niha) di rojevê de be, rêgez (prensîb) be! Ji bo neteweyekê "yekîtî" wicûdî (varoluşsal) ye, strukturel e. Yanî tiştekî wisa nîne ku "hinek kurd niha bixin rojevê" lê sibê ji rojevê derxin!

Tiştê ku divê niha di rojeva kurdan de be, ev e: Li Sûrîyê êdî proseya çêkirina qanûna esasî dest pê kiriye. Divê hemû kurd bi kurdên rojavayê Kurdistanê re bin, piştgirîya wan bikin ku li wir kurd bibin xwedanê statuteyeke resmî. Divê stranbêj û hunermendên kurd li Ewropayê ji bo ku kurd di qanûna esasî ya Sûrîyeyê de cih bigirin û bibin xwedanê statuyekê bimeşin. Eger na, "yekîtîya neteweyî ku niha di rojeva kurdan de" ye dibe perdekirina vê rojeva elzem! Ji alîyê din ve, yên ku pê re şiûra neteweyî tune be çawa yekîtîya neteweyî çêdikin? Şiûra neteweyî niha li ser me ferz dike ku em bi tevayî dîqeta xwe bidin ser proseya çêkirina qanûna esasî ya Sûrîyeyê ne ku ser tiştekî din! Û wek ferd, jixwe hîç mimkun nîne kes bi kesî re bibe yek. Çimkî her kes bi xwe "yek" e, dê çawa bi yekî din re bibe yek? Ji vê çendê çi kes an sazîya ku xizmeta xurtkirina şiûra neteweyî bikin, ancax em ê "bi hev re" bin. Ji bo kesan, ji bo sazî û partîyan jî 'bihevrebûn' rasttir e ji 'yekbûn'ê.

Şersala we Pîroz Be

*Serê salê binê salê xwedê aştî û azadiyê bîne vê malê. Bi van hest û hêviyan em sersala hemû gelên cîhanê û bi taybetî ya gelê xwe pîroz dikin. Di vê zivistana sar de em bi hêviyên germ dibêjin û lava dikin ku sala nû bi xwe re aştî, aramî û azadiyê bîne...*

ERGANİ BELEDİYESİ 1923

**Hevşaredarên Erxeniyê**
**û Endamên Meclisa Şaredariyê**

# Sersala *gelên me* PÎROZ BE!

Sala 2019'an di nav şer, dagirkerî û qeyranên îdarî, civakî û aborî de derbas bû. Geh li welatê me geh li Rojhilata Navîn geh jî li tevahiya cîhanê, ji ber şerê desthilatiyê xisar û ziyaneke mezin li ser gelan çêbû. **Xetereyên li ser mirovahiyê, metirsiya li ser gelên bindest hîn jî berdewam dikin.**

Di sala 2019'an de ligel êrişên bloka faşîst a AKP-MHP'ê, **berxwedana me ya domdar reng û mohra xwe li sala 2019'an xist.** Li dijî qirkirina siyasî û bêîradekirinê, em îro jî navenda berxwedana hevpar û hêviya azadî, aştî û demokrasiyê ya gelan e. **Li hemberî êrişan em îro li vir in û bi serbilindî li ser piyan e.**

Em di nav berpirsyariyên dîrokî û civakî yên mezin de pêşwazî û xêrhatina sala 2020'an dikin. **Di sala 2020'an de berxwedana me ya li dijî dagirkerî, faşîzm, binpêkirina mafên mirovî dê bi bawerî bidome.** Em baş dizanin, bilindkirina berxwedana me ya hevpar, avakirina yekîtiya me dikare rê li ber vê pergala faşîst a AKP-MHP'ê bigire.

**Di sala 2020'an de em bi ruhê berxwedaneke topyekûn, rêxistina xwe xurt dikin.** Sala 2020'an dê bi berxwedana me û bidestxistina destkeftiyên me xweş û watedar bibe. Di rêya avakirina azadî, demokrasî, jiyaneke aram û aştiyeke bi rûmet û mayînde de, **em saleke nû û siberojeke xweş ji bo we dixwazin.**

**Hêviya me ew e ku sala nû ji bo gelê me bibe sala yekîtiya netewî.**

Sala 2020'an li tevahiya gelên cîhanê pîroz be.

**Pervîn Buldan – Sezaî Temellî**
Hevserokên Giştî yên HDP'ê



# Ziman û nehabandina kurdan

Dewleta tirk polîtîkayên berê didomîne û îro li aloziyê û di sûkekê de asê maye. Ronî tê de naxuyê lê israra berdewama vê serhişkiyê heye

Yaşar Eroglu



Ziman nasnameya her neteweyê ye. Çend xalên sereke yên nasnameya neteweyan diyar dikin hene. Ji wan a herî sereke ziman e. Her gelekî ji bo her tiştekî ku di jiyana wî gelî de heye re, navek dîtiye. Her liv, lebat û kiryara di nav civakê de pêk tê, bi van navan re ditêkilîne û ragihandin pêk tê. Nav, têkilî, ragihandin, wate û mirov; ev hêma hemû ziman bi xwe ne.

Navlêkirin ango navandin li gorî mantiq, ramandin, awayê jiyanê û têkildariya her gelekî, xweseriyê nîşan dide. Carinan nêzikbûna erdnîgariyê zimanên cîran, van hêmayan jî çar neçar nêzîkî hev bîne jî, para mezin xweseriya her ziman e. Her çiqas beşa gelên îranî, beşa latînî, beşa silavî, beşa anglo-saksonî, beşa samî, beşa turanî û hwd. ji ber hin hevpariyên wan (ev hevparî ji dîrokê, têkiliyên aborî, jiyana di nav hev de -berê sînor tune bûn- û têkiliyên dînî-mezhebî û hwd. tê) wan gelek bişibîne hev jî, kurdekfarisek, îtalî û spaniyek, rûs û bûlgarek, alman û îngilîzek, ereb û cihûyek, tirk û ozbekek bi xweseriyên xwe dirûv digirin û difikirin. Her gel û neteweyek li gorî mantiq, ramandin, awayê jiyanê û têkildariya xwe serad û bêjinga xwe peyda dike û ziman di vê bêjing û seradê re derbas dibe.

Weke mînak, navên Zozan, Xezal, Zînê, Kejê, Sosin, Qenco, Şêrgo, Zewal, Kejo, Rohat, Şevger, Bahoz bi mantiq û ramandina kurdî hatine lêkirin. Pirên wan jî şibandin in ku jiyana kurdan jî sembolîze dikin. Lê Eyşê, Fatme, Helîme, Hebîb, Bedir, Cemal, Hesen, Huseyn jî hene ku bi riya dîn ketine jiyana kurdî. Her du jî tên fêmkirin ku mantiqê wan çi ye. Serê pêşîn mirov dikare wiha bêje, kurd zêdetir ji şibandina xwezayê hez dikin, ereb îlhama xwe ji cur bi cur tiştan digirin; lê hêmaya wan hevpar hêmaya dînî ye. Di nav kurdan de xweza dewlemend e, di nav ereban de dîn li pêş e. Mirov dikare mînakan dewlemendtir bike.

Tenê navên mirovan na, navên nebatan, çiyayan, çeman, liv û lebatan, cismanî ne û cismanî her tişt tê binavkirin. Bi vî awayî ziman taybetiya gel an jî neteweyekê dinimîne. Ev taybetî wek neqşekê, zimanekî ji yê din cudatir dikin. Ev yek ji bilî nasmeyê tiştek nîn e. Jixwe nasname ji bo taybetiyên jihevcudakirinê tê bikaranîn.

Mohra zimanê kurdî li ser hebûna me ye. Kurd berî her tiştî bi zimanê xwe tên naskirin. Mohra me zimanê me ye. Hêmaya herî sereke ya ku mêtingeran heta îro nikaribûne tune bikin, ziman e. Bi gotina sînor yek in, dîn yek e ji aliyê erdnîgariyê û dîn ve nasname dikare bê pênasekirin, lê ji aliyê cudatiya ziman ve nasname nikare bê pênasekirin.

Dewletên dagirker û mêtinger vê rastiyê ji xwediyê nasmeyê zêdetir dizanin. Ji ber ku ew ji roja destpêkê heta dawiyê tunekirina nasmeyê ji xwe re dikin armanc û bênavber êrîşê dibin ser. Êrîşên xwe bi plan û bername pêk tînin. Xurtî û qelsiyên nasnameyê nas dikin. Ji bo ku armanca xwe bibe serî, xebatên veşarî û eşkere di zanîngeh, înstutî, akademî û cihên cur bi cur de pêk tînin. Ew ê kîjan êrîşê kengî bînin ser nasnameyan baş dizanin. Ji hinek planên xwe re jî keys û firsetê dipên ku roja wê tê serê van êrîşan berdidin û planên xwe dikin meriyetê.

Dewleta ku ji bo tunekirina nasnameyan herî zêde xwe bi plan û proje kiriye dewleta tirk e. Gelek profesyonel dixebite, beşên dewletê yên ji bo vî karî hatine organîzekirin pêk anîne. Ji ber ku bingeha nasnameya tirk ne xurt e, gelên ku pê re dijîn di serî de kurd ji bo nasnameya xwe xetere dibînin, hebûna wan nahebînin. Di bingeha ramana pêkanîna yek milet û yek zimaniyê de ev rastî cihekî sereke digire. Pê re tevî amûrên şîdetê van polîtîkayên xwe dike meriyetê.

Raporên ku li ser navê dewleta tirk hatine amadekirin pir eşkere vê rastiyê tînin ziman. Hemû hêmayên nasnameya kurdên Dêrsimê diyar dikin, yek bi yek hatine raporkirin. Bi zimanekî dijminane êrîş tê kirin. Piştî raporan hem bi riya komkujî, şîdet û zextê hem jî bi riya politikaya qetliyama spî rapor hatine pratîzekirin ku êdî haya her kesî jê heye.

Polîtîkayên tunekirinê yên piralî ji raporên li ser Dêrsîmê dest pê kirine heta îro li Kobanê û Serêkaniyê dewam dikin. Bi qetliyamê re nasnameya Dêrsimê qedexe kirin; hêmayên wê yên pîroz, zimanî û çandî… Bi navê Dêrsimê dest pê kirin; navê Dêrsimê bi Tunceliyê guhertin. Dêrsim nasnameya kurdên herêmê temsîl dike. Deriyê Sim, yanî deriyê zîv bû wateya wê û nasnameyeke kurdî bû. Dewletê ew nav weke mirovên Dêrsimê bi şîdetê tune kir; 'tunc eli' yanî deriyê zîv bi destê bronz hilweşand! Rastî jî wisa bû û wateyeke tunekirinê ya herî xedar li ser mohr kir.

Di sala 1954'an de bi riya qanûnekê navên hemû gundên Kurdistanê guherandin, navên bi tirkî li wan kirin. Piştre polîtîkayên asîmîlasyonê bilind bûn. Lêkirina navên kurdî qedexe kirin, eger navên me bi kurdî hatibûna danîn, digotin li kevneşopî û çanda tirkî nayê û nav qebûl nedikirin.

Kurdên Rojava bi salan e statûyeke fîîlî ya xweser ava kirine û dest bi jiyaneke nû kirine . Dewleta tirk hem bû dijminê vê statuyê hem jî hebûna kurdan. Di cîhanê de li ku derê kurdek an jî liv û tevgera kurdî hebe dewleta tirk xwe gij dike, êrîşê dibe ser.

Dewleta tirk ji ti hêmaya ku nasnameya kurdî temsîl dike re tehemûlê nîşan nade. Ligel qetliyam, rûxandin, bombekirin, talan û wêrankirinê dev ji dijmintiya navên kurdî bernade. Navên ku nasnameya kurdî lê ne hedef digire navên dewleta ereb a Baas (ku ew jî mîna wan mêtinger û dagirker e) lê kiriye bi kar tîne. Navên ereban lê kirine dihewîne lê navên kurdî weke kelemên di çavên wan re diçin qebûl nake. Kurdên Rojava bajarên xwe weke Serêkaniyê, Kobanê, Girêspî bi nav kirine. Nasnameya kurdî di wan navan de şênber bûye. Dewleta tirk ti car wan navan bi kar nayne û naxwaze bibihîze. Zimanê kurdî û nasnameya wan a kurdî vedişêre bi israr navên dagirkerên ereb radigihîne. Serêkaniyê weke Resûlayn, Kobanê weke Aynelarap, Girêspî weke Telabyad bi nav dike û di ragihandinê de bi kar tîne. Hesab ev e, eger navên tirkî minasib nebin jî qet nebe bila navên wan ên erebî bên naskirin. Wexta ku Efrîn dagir kir navê çiyayê Kurmênc weke Turkmen Dagi guherand. Navê Cindirêsê weke Cîn Deresî bi kar tîne. Gava navê kurdan berguh dikeve, ta têne dewleta tirk û nexweş dikeve. Bajarên navborî dixwaze bi projeya dagirkirinê ji kurdan bişo û demografyayeke bê kurd lê ferz bike. Dixwaze ew navên ku qam di seranserê dîrokê de bi çand, folklor û zimanê kurdî de hatine honandin û pêk hatine ji erdnîgariya kurdan bişo pençeyê xwe yê bi xwîn weke mohrekê deyne ser hebûna kurdan, bi vî awayî dagirkeriya xwe rewa bike.

Nijadperestiya tund riya rasîzmê vedike. Rasîzm, rêgezperestî ye. Ji xeynî nijada xwe nijadan qebûl nake, nijada xwe di ser her nijadê re dibîne. Ev politikaya tund û tûj tenê yek zimanî û yek neteweyiyê dihebîne. Kîjan neteweyê ji xwe re dijmin qebûl bike, bi her awayî ji bo tunekirina wê hewl dide, biratî û wekheviya wan qebûl nake. Encama vê politikaya tund û regezperest wêranî ye, heta niha ji hesabê tu dewletê re jî serkeftin nehatiye nivîsandin.

Wek envcama vê politikayê, dewleta tirk îro li aloziyê asê bûye. Îro di sûkeke asê de maye. Ronî tê de naxuyê lê israra berdewama vê serhişkiyê heye. Helbet dîrok bi dersan dagirtî ye. Peyrevên vê polîtîkayê ne pêkan e ji aqûbeta pêşrevên xwe cudatir tiştekî bibînin. Dîrokê seranser zilm û zordarî jî nivîsiye lê berxwedana gelan jî seranser bi serkeftinê neqişkirî ye.




## Ziman û Raman



Samî Tan

### Ziman guhartin

Ev dem û hemû demên we xweş û geş bin gelî xwînerên Xwebûnê. Hefteya çûyî piştî destpêkeke kurt me hinekî qala mijara helwesta zimanî kiribû. Me dabû zanîn ku piştî vekolan û lêhûrbûnên dûvedirêj, zimannas û zanyar gihaştine wê baweriyê ku helwesta zimanî ya axêverên zimanekî çarenûsa wî zimanî diyar dike.

Dema ku me helwest got, ne tenê tiştên dike, her wiha tiştên ku nake, tiştên ku hîn bûye, lê rûniştine jî pir girîng in. Divê em ji bîr nekin ku carinan bêhelwestî jî helwestek e. Piştî ku jehra polîtîkayên pişaftinê di dil û mêjiyê de me rehên xwe berdan û şax vedan, êdî pêwîst nake kes tiştekî bike. Bo nimûne kes ji me ra nabêje, di mala xwe da bi zarokên xwe ra bi tirkî bipeyivin.

Hin caran mercên aborî me ber bi tirkîfikasyonê ve dehf didin, em wisa bawer dikin ku em bi zarokên xwe ra bi tirkî bipeyivin ew ê di demên pêş da zarok karibin xwe bi hêsanîtir bigihînin derfetên aborî; karibin ji xwe ra karekî baş peyda bikin û jiyaneke dewlemend û bextewar derbas bikin.

Hin caran kurdîya me ya toreyî û gelêrî têrî derbirîna hest û ramanên di jiyana bajarî da nake, lewma jî em ji mecbûrî peyv, biwêj û qalibên tirkî dixin nava zimanê xwe. Bi domana demê ra zimanekî dureh derdikeve holê; êdî wisa lê tê, em nizanin ka em li ku bi tirkî, li ku bi kurdî dipeyivin, bi awayekî jixweber em ji zimanekî derbasî zimanekî din dibin. Di lîteratûra zimannasîyê da ji vê yekê ra kodguhartin tê gotin. Ev rewş qonaxa pêşîn a zimanguhatinê ye. Zimanguhartin heke em bi awayekî din bibêjin, helwesteke berevajî helwesta Ehmedê Xanî ye, lewra ew dibêje:

*Safî şemirand vexwarî durdî*
*Manendê durrê lîsanê kurdî*

Em jî di vê rewşê da dev ji durra xwe berdidin, bi pey zêr û zîvên xelkê dikevin, lê pirî caran em hem her duyan jî bi dest naxin û dest vala dimînin. Her wekî pêşiyên me goti: "Destê vala li ser zikê birçî" dimîne, em dibin mirovên nîv-duzimanî. Zarokên me jî çand û zimanê xwe dûr dikevin, êdî ew dibin tirkên nûhatî, belkî bi bîr û bawerî hêşta kurd bin, lê êdî bi dil û mêjî dûrî kurdiniyê ne.

Her wekî me hefteya çûyî dabû xuyakirin, mijara parastin û geşkirina zimanan, bi taybetî di dawîya sedsala bîstan da ketiye rojeva mirovan, bi domana demê ra piştgirîyeke berbiçav û saziyên navneteweyî jî wergirtiye. Li gel vê yekê ev mijara wekî şaxeke zimannasîya pêkarî bûye warê vekolan û lêkolînan.

Helbet çend sedemên vê yekê hene; sedema pêşîn ev e ku li hemberî polîtîkayên pişaftinê yên netewe-dewletan, helwesta parastina ekolojîya zimanî , li dijî gerdûnîbûna ku yekrengîyê li ser mirovan ferz dike jî ramana pirzimanî û pirçandî bi pêş ketiye.

Belê pirzimanî, lê pirzimanîyeke çawa? Helbet pirzimaniyeke li ser bingeha yeksanîya zimanan. Îro her wekî mirovan di nav zimanan da jî hîyerarşiyek heye. Vê hîyerarşîyê hinek ziman kirine bikujên zimanên din. Heta ku ev rewş neguhere, dê pirzimanî jî bi têkçûn û windabûna zimanên bindestan bi dawî bibe. Lewma jî serê pêşîn divê piştgirî û piştevaniya zimanên bindest were kirin.

Li gorî lêkolînan li ser rûyê cîhanê xwar û jor 7000 ziman hene, bi pêşbînîyeke çakbîn ji sedî 50ê wan dê heta sala 2100î ji holê rabin. Hinek zanyarên bedbîn dibêjin dê ji sedî 90ê van zimanan sedala bê nebinin. Kurd jî divê li gorî vê rewşê helwesta xwe helwesta xwe diyar bikin û vê helwestê nîşanî her kesî bidin.

# Ji bo berjewendiyên xwe şer kûr dikin

Dewlet ji bo berjewendiyên xwe li Rojava polîtîkayên şer bi pêş dixin. Di encama van polîtîkayan de gel bi êrîş, komkujî, koçberî û xizaniyê re rû bi rû dimînin. Dixwazin pergala jiyana alternatîf ji holê rakin

NAVENDA NÛÇEYAN

Şoreşa Rojava ya ku xwe dispêre yekitiya gelan û azadiya jinan, çawa ku karakterê xwe yê demokratîk, ekolojîk û azadîxwaz diyar dike, di heman demê de alternatîfeke nû jî pêşkêş dike. Ji ber vê jî ji 9'ê cotmehê ve êrîşên li hemberî Rojava didomin. Dewletên li derdorê jî ji bo berjewendiyên xwe bêyî ku gel li hemberî çeteyan biparêzin şer kûrtir dikin.

Hêzên hegemonîk ên navendî yên mêtinger di navbera gel, bawerî û çandan de cudakariyê dikin û bi qetilkirina gel dixwazin hebûna xwe bidomînin. Şoreşa Rojava ya ku xwe dispêre pergala konfederalîzma demokratîk a ku bingeha wê paradîgmaya demokratîk, ekolojîk û azadiya jinan e, tê wateya avakirina pergala ku van polîtîkayan pûç dike û alternatîfekê pêşkêş dike. Şoreşa Rojava bi projeya xwe ya neteweya demokratîk ji zû ve di nav têkoşîna azadiyê ya gel û jinan de cihê xwe girtiye. Lê hêzên hegemonîk ên navendî yên ku di 9'ê cotmehê de rayeyeke xurt dane Tirkiyeyê, li pêş çavê cîhanê hewl didin vê pergalê tune bikin.

**Yekitiyê parçe dikin**

Li gel êrîş, komkujî, koçberî û xizaniyê Tirkiye, rejîma Sûriyeyê, Îran, Rûsya û Amerîka ji bo berjewendiyên xwe tevdigerin û nahêlin ku pergala jiyaneke alternatîf ya ku ji cîhanê re bibe mînak bi pêş bikeve. Di demên nêz de hevdîtina şandeya tirk a bi Rûsya û Rêjima Sûriyeyê re bû rojeva sereke. Tirk û rûsan derb arê Idlibê de li hev kirin. Her wiha di demên dawiyê de li dijî rêveberiya xweser û pêkhateyên herêmê jî polîtîkayên parçekirinê hatin meşandin.

**'Em li dijî parçebûnê ne'**

Şêxê eşîra Sadê El-Tihêhê Mihemed Belhelûş li ser hewldanên bi armanca parçekirina di navbera eşîran de got: "Îdiayên berpirsên rejîma Sûriyeyê û hevalbendê wê bê bingeh in û em wekî eşîrên ereb van îdiayên ku rêveberiya xweser û pêkhateyên herêmê hewl didin ku Sûriyê parçe bikin, red dikin. Em wekî gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê li dijî êrîşan derdikevin û dibêjin ku tu nakokî di navbera pêkhateyên herêmê de tune ne. Em rê nadin van hewldanên parçekirina pêkhateyan."

Lêkolînerê siyasî û rojnamevanê sûriyeyî Melêk El-Hafiz jî bal kişad ser lihevkirina Moskova û Enqereyê û wiha got: "Êrîşên dawî yên Tirkiyeyê bi taybet li ser Idlibê ne. Her wiha rejîm di danûstandinên bi HSD'ê de hişk nêz dibe. Bi qasî ku dixwaze şertên xwe li ser HSD'ê ferz bike naxwaze pê re bikeve diyalogê. Rejîm dixwaze vegere pergala berê ya beriya 2011'an. Lê bi giştî ew nikare serweriya xwe li wir ferz bike. Di vê mijarê de dê pişta xwe bide Rûsyayê. Mîna ku mijarên din ên wekî dosyaya Sûriyeyê radestî wê kirin. Lê Rûsya di mijara pêkhatina lihevkirinek dawîn a di navbera Sûriyê û HSD`ê de lez nake. Lê belê dixwaze nimuneya Deraayê li herêmên rojhilatê Firatê ferz bike. Di encamê de wê tevliheviyek çêbibe. Rûsya dixwaze sûdê ji vê bigire heta bigihêje çareseriyek dawîn lê li gorî nêrîna xwe ya taybet."

**Civîna Moskovayê**

Midûrê Navenda Kurdên Sînor Nenas Kardo Pîrê jî di axaftina xwe de bal kişand ser hewldana dewleta Tirk a têkbirina HSD'ê û rêveberiya xweser û wiha axivî: "Tirkiye niha hewld dide ku projeya Rêveberiya Xweser ji holê rake û demografiya herêmê biguherîne. Tiştên niha rû didin, tenê beşek ji hevpeymanê ne. Civînên li Moskova û şerê li Idlibê rastî hev hatin. Ez bawer im ku danûstandinên vê carê jî di navbera rejîmê û Tirkiyeyê de rasterast bûn û gihaştin lihevkirinekê. Dibe ku Tirkiye bi rêya Rûsyayê zextê li rejîmê bike û bi vî awayî hewl bide HSD'ê têk bibe. Tevî nêrînên ji civînan derketin, hîn jî ne zelal in. Lê bi awayekî giştî der barê Sûriyê, HSD'ê û dosya Lîbayê de li hev kirinek heye."



# Enqere siyaseta sondajê dike

NAVENDA NÛÇEYAN

Di nav hefteyê de mijarên ku ji hêla raya giştî ve hatin nirxandin, biryara şandina leşkeran a ji bo Lîbyayê ya Tirkiyeyê û biryara Danold Trump bû. Di her du mijaran de jî hat xuyakirin ku rewşeke aloz li pêşiya Tirkiyeyê.

Tirkiye dixwaze bi çend gavan xwe li ser piyan bigire. Ya herî balkêş jî ew bû ku Tirkiye li derveyî tifaqa li Behra Spî ya Rojhilat hat hiştin û niha jî hewl dide ku bi rêveberiya Trablûsê re li ser piya bimîne. Lê ev nîşaneya hilweşandina siyaseta Enqereyê ye.

Di sala 2011'an de piştî Muammer Qedafî hat kuştin, li Lîbyayê îstîkrareke siyasî pêk nehat û ji wê demê ve ye şerê naxweyî didome. Li hemberî DAIŞ'ê gelek operasyon pêk hatin. Piştî ku serweriya DAIŞ'ê hat bidawîkirin li welat pirsgirêka du hikûmetan derket holê. Aliyek hikûmeta Arteşa Neteweyî ya Lîbyayê ku navenda wê li Tobrûkê ye û aliyê din jî, Hikûmeta Mutabakata Neteweyî ya navenda wê Trablûsê ye, hatin avakirin. Rûsya, Fransa, Urdun û Yekitiya Emîrên Ereb piştgiriyê didin hikûmeta Tobrukê û Îtalya, Tirkiye û Katar jî piştgiriyê didin Hikûmeta Mutabakata Neteweyî ya Trablusê.

Di 9'ê kanûnê de Tayyîp Erdogan diyar kir ku heke Hikûmeta Mutabaqata Neteweyî bixwaze em ê leşkeran bişînin Lîbyayê. Pêşniyara Erdogan ji hêla Desteya Wezîran a Lîbyayê ve hat qebûlkirin. Pêşniyarname hat meclîsa Tirkiyeyê û di meclîsê de HDP, CHP û Partiya ÎYÎ li dijî pêşniyarnameyê derketin. Lê bi dengên AKP û MHP'ê pêşniyarname hat qebûlkirin. Ev tişt ji hêla siyasetmedarên Tirkiyeyê ve hat nirxandin û rastî nerazîbûnan hat. Her wiha Yekitiya Ewropayê, Amerîka, Rûsya û gelek welatên ereb jî nerazîbûna xwe ya ji bo vê peymanê anîn ziman.

Der barê siyaseta ku Tirkiye li Rojhilatê Behra Spî dide meşandin de pisporê têkiliyên navneteweyî Prof. Dr. Îlhan Ûzgel nêrîna xwe anî ziman û diyar kir ku Tirkiye bi keştiyên sondajê siyasetê dike û got: "Tirkiye dixwaze ligel lewaziya xwe hebûna xwe li herêmê biparêze. Ji bo vê jî xwest hin pêngavan bavêje. Lê belê aktorekî ku pê re pêngavan bavêjin tune bû, loma xwe nêzî rêveberiya Trablûsê kir."

**Tirkiye li derve ma**

Di sala 2009'an de li herêmê her diçe Îsraîl, Komara Rûm a Qibrisê, Yewnanistan û Misir xurt dibin, her çar welatan tifaqek çêkiriye. Ûzgel der barê mijarê de wiha got: "Hevsengiya li vir di eleniya Tirkiyeyê de çêbû. Her wiha van 4 welatên di warê tifaqan de têkiliyên baş danîn. Bang li Fransa, Îtalya û Rûsyayê jî kirin. Parek dan Rûsyayê jî. Yanî blokeke hîn dorfirehtir çêkirin. Tirkiye li derveyî van pêvajoyan ma. Tirkiye jî bi şandina du keştiyên sondajê siyasetê dike."



**Li hemberî Tirkiyeyê ne**

Tê zanîn ku Yekitiya Ewropayê li heremê li hemberî Tirkiyeyê ye û Ûzgel jî destnîşan kir ku YE, li wir bi Yewnanistan, Komara Rûm a Qibrisê û Îsraîlê re dixebite û got: "Her wiha du hêzên mezin ên Behra Spî; Fransa û Îtalya jî li wir in. Fransa û Îtalya pereyekî mezin ji bo Behra Spî û Lîbyayê xerc kiriye. Yanî bi her awayî li wir li hemberî Tirkiyeyê ne."

Tê zanîn ku li Sûriyeyê, Tirkiye û Rûsya li hemberî hev bûn, lê bi awayekî rewşa xwe tolere kirin û Rûsya Tirkiyeyê li heremê hişt. Ûzgel di axaftina xwe de bal kişand ser mijarê û wiha axaftina xwe bi dawî kir: "Rûsya leşkerên bi pere şandine herêmê. Lê ev yek ji bo her du welatan jî ne xem e. Ji ber ku li Sûriyeyê Rûsya û Tirkiye li hemberî hev bûn, piştre li hev hatin û şûnde Rûsya bi awayekî Tirkiyeyê li herêmê hişt."



# Komkujiya veşarî: Hezar û 606 karker mirin

MEHMET ALÎ ERTAŞ

Li Tirkiyeyê ji ber polîtîkayên desthilata heyî ked û jiyana mirovan her diçe erzantir dibe. Ji ber lewaziya rêxistiniya kareran û polîtîkayên deshilatê, karker ji gelek mafên xwe bê par mane. Her roj di gelek beşên kar ên cuda de karker ji ber xebata bê ewle dibin qurbaniyên karê dikin. Bi taybetî jî ev çend salên dawîn bêhiqûqî yên li hemberî karkeran zêdetir bûne.

Nirxê kedê tune be nirxê jiyana mirov jî tune ye. Her ku diçe saetên kar zêde dibin, destheqê kedê kêm dibe. Hatiye asteke ku wisa ku em dikarin bêjin mirov di şert û mercên koletiyê de dixebitin. Hemû kesên patron û serdest li ser ked û xwêdana karkeran xwe mezin dikin. Ev rewş bûye wek nexweşiyeke ji ber vîrûsê. Çawa ku vîrus di laşê mirov û zindîweran de hebûn û serweriya xwe ferz dikin, serdest, patron û sermayedar jî hebûna xwe li ser ked û xwêdana mirovan ferz dikin û wan dikin şert û mercên koletiyê.

**Gelek qurbanî neketin qeydan**

Li gorî dane û raporên sendîka û meclîsên karkeran ên hatine amadekirin, li Tirkiyeyê di meha mijdarê de 126 karker bûn qurbaniyên kar. Her wiha di 11 mehên sala 2019'an de bi tevahî hezar û 606 karker jiyan xwe ji dest dan. Bi sedan karkerên li derveyî qeydan jiyana xwe ji dest dan û neketin raporan jî.

Di sala 2019'an de di nav hezar û 606 karkeran de, 99 karkerên penaber û 67 karker jî zarok bûn. Ev jî nîşan dide ku hem mafên penaberan û hem jî mafên zarokan di qat tên binpêkirin. Hem keda wan tê xwarin hem jî mafên wan ê zaroktî û penaberiyê tên binpêkirin. Tenê ev hejmar nîşanî me dide ku li Tirkiyeyê keda mirovan çiqas hatiye erzankirin.

**Karkeran dawî li jiyana xwe anîn**

Dîsa ji ber keda erzan û krîza aborî rêjeya xwekuştinê jî zêde bû. Li gor daneyên ÎSÎG'ê, di sala 2013'an de herî kêm 15, di sala 2014'an de 25, di sala 2015'an de 59, di sala 2016'an de 90, di sala 2017'an de 89, di sala 2018'an de 73 karkeran li cihê kar û derve dawî li jiyana xwe anîn. Di serdema desthilata AKP'ê ya di navbera salên 2002 û 2018'an de herî kêm 4 hezar 481 kesan dawî li jiyana xwe anîne.

Dîsa li tevahiya welatê Ewropayê bi giştî 3 hezar û 710 karkeran jiyana xwe ji dest dan. Di sala 2016'an de li Fransa 528 karker, li Îtalyayê 417, li Almanyayê 384, li Îspanyayê 271, li Romanyayê 229, li Îngilistanê 222, li Polonyayê 198, li Portekîzê 130 û li Avûsturyayê 100 kerkeran jiyana xwe ji dest dan.

Li gorî daneyên Ewropayê qeza zêde ne lê mirin kêm in. Lê li Tirkiyeyê hem qeza zêde ne û hem jî mirina karkeran zêde ye.

# Jin pêşengiya yekitiyê dikin

## Jinên kurd ku di têkoşîna azadiya gelê kurd de her di dîrokê de rola xwe lîstine û gelek caran pêşengî kirine. Her wiha ji bo yekitiya neteweyî ya kurd jî gelek bedêl dane û peywira xwe anîne cih

NAVENDA NÛÇEYAN



Li her çar parçeyên Kurdistanê pêvajoyeke hestiyar heye. Pirsgirêkên kurdan ên siyasî û civakî, polîtîkayên dewletan ên li ser înkar û redkirina nasnameya kurdan, pirsgirekên ku jinên kurd dijîn di demên dawiyê de bêhtir xwe didin der. Ev polîtîkayên taybet ên di esasê xwe de li ser jinên kurd in bêhtir bandora xwe dikin.

Jinên kurd li dijî şerê naxweyî û ji bo aştî û yekitiya neteweyî ya kurd biafirînin, bi salan e wek kes, rêxistin, platform û kom di nav xebatan de ne. Her wiha bi piralîbûna xwe, perspektîfên xwe yên rojene û dîrokî, rêbazên cuda yên têkoşînê û bi tecrûbeyên xwe yên bi salan, li hev dicivin û hêza xwe dikin yek.

**Ji bo yekitiyê 2 konferans**

Cara yekem di sala 2010'an de li Amedê Konferansa Neteweyî ya Jinên Kurd hat lidarxistin û ev ji bo kurdan mînakek girîng bû û jinan pêşengiya xwe aşkera kir. Ji her çar parçeyên Kurdistanê jin tev li konferansê bûn, nêrînên xwe anîn ziman û li ser hewcedariya yekitiyê rawestiyan. Piştre jî konferansa 2'yemîn di sala 2012'an de li Hewlêrê pêk hat. Biryardariya jinên kurd ji bo yekitiya gelê kurd didome, ji ber vê jî niha hewl didin ku 3'yemîn konferansa jinên kurd li dar bixin.

**Bila tifaqa herêmî pêk bê**

Kesên xwedî nerînên cuda û xwedî ferasetên siyasetên cuda li hev dicivin û armanc dikin ku di navbera kurdan de aştî û diyalog bi pêk were. Cîgira Serokatiya Giştî ya Partiya Mirovahî û Azadiyê Menîce Rumeysa Gulmez jî li ser girîngiya yekitiyê rawestiya û got: "Hemû pirsgirêkên kurd dijîn, ji ber tunebûna tifaqê ne. Kurd li Rojhilata Navîn cuda tên dîtin û di pêvajoyeke ku kurd neçar dimînin li hember çar delatan têbikoşin de, divê teqez ligel hev bin. Kurd nikarin ji hev cuda bibin. Nebûna tifaqê tê wateya parçebûnê. Ji ber vê wê tifaqeq zehmet be. Divê em ewil di nav xwe de yekitiya herêmî ava bikin. Piştî tifaqa herêmî pêk hat wê gel biryara xwe bide. Di meşandina tifaqa kurdan de keda jinan gelek mezin e. Li her qadê bi qasî mêran, jin jî di vê têkoşînê de xwedî ked in."

**Konferansê asteng dikin**

Endama Desteya Hevserokatiya Tevgera Azadiyê Ronak Mecîd jî di axftina xwe de bal kişand ser konferansa 3'yemîn a jinan û wiha got: "Lidarxistina konferansa neteweyî ya jinên kurd ji bo gelê kurd gelek girîng e. Ez bi hêvî me ku lidarxistina Konferansa Neteweyî ya Jinên Kurd dê bibe wesîleya lidarxistina kongreya neteweyî ya gelê kurd. Paşdexistina 3'yemîn Konferansa Neteweyî ya Jinên Kurd, ji ber hinek sedeman e. Hinek partiyên Başûr ji ber tirsa dewletên derve û berjewendiyên xwe yên şexsî naxwazin konferansek wiha bê lidarxistin. Ji bo ev konferans pêk were divê hemû jinên endamên hemû partiyan hewl bidin."

**Konferans nîşaneya yekbûnê ye**

Endama Parlamentoya Kurdistanê Rojanî Şehîd Heme Reş jî wiha got: "Ji ber astengiyên hinek aliyên siyasî dema lidarxistina 3'yemîn Konferansa Neteweyî ya Jinên Kurd tê dirêjkirin. Lidarxistina vê konferansê di heman demê de nîşaneya yekbûnê ye. Ji bo em di nav xwe de pirsgirêkên xwe çareser bikin û yekitiyekê ava bikin ev konferans cihekî wê yê girîng heye. Divê demildest bê lidarxistin."

### Encamnameya platformê aşkera bû

Di 22'yê kanûna sala 2017'an de jinên kurd ên li Tirkiyeyê li hev civiyan û Plaftoma Yekitiya Jinên Kurd ava kirin. Hefteya borî jî jin bi minasebeta salvegera damezrandina platformê civiyan. Platform encamnameya hevdîtina xwe aşkera kir. Xalên encamnameyê wiha hatin diyarkirin:

✓ Heta kurd nebin yek di serî de jinên kurd, li çar aliyên Kurdistanê ji qirkirin û polîtîkayên metingeriyê xilas nabin.

✓ Çarenûsa azadiya me li hemû parçeyên Kurdistanê yekitî û azadiya kurdan e. Em dixwazin bi baweriya xwe ya têkoşer û pirsyarker bang li siyasertmedarên kurd û gelê kurd bikin.

✓ Ji hemû aliyan em jinan di yekitiya kurdan de wek hêzeke mezin qebûl dikin. Dîsa em îdeolojiyên fermî yên ku jinan tune dihesibînin, serdestiya meran a feodal û mîlîtarîst qebûl nakin.

✓ Em li hemberî 'parçekirina' li me hatiye ferzkirin derdikevin. Ji bo azadiya kurdan nêrîna jinan, daxwaza yekitiyê em derdixin pêş.

✓ Em ê hewldana diyaloga ji bo yekitiyê zêdetir bikin û careke din bi israr bang dikin; yan em ê bibin yek an jî em ê yek bi yek tune bibin.

✓ Em ê hewl bidin ku daxwaza Eyşe Şan a veşartina xwe ya li Amedê binîn cih.

✓ Em li hemû jinên kurd bang dikin û dibêjin 'Ey kurdino, ger ku em nebin yek, em ê biçin yek bi yek'.

# Li çar parçeyan bûyerên girîng ên sala 2019'an

Di sala 2019'an de li bakur, rojava, başûr û li rojhilatê Kurdistanê gelek bûyerên girîng pêk hatin. Li her parçeyeke Kurdistanê mijarên cuda derketin pêş.


Li Bakur grevên birçîbûnê, li Rojava êrîşên li hemberî sivîlan, li Başûr jî têkoşîna gel a li dijî desthilatê û li Rojhilat jî xwepêşandanên girseyî mohra xwe li salê xistin. Lê bi awayekî hevpar yekitiya neteweyî bû mijara her çar parçeyên Kurdistanê.



**Li Bakur tecrîd û qeyûm**

Li Bakur jî mijarên herî sereke tecrîd û qeyûm bûn.

✓ Li dijî tecrîda li hemberî Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan Hevseroka Kongreya Civaka Demokratîk (KCD) û parlamentera Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) a Colemêrgê Leyla Guven di 8'ê mijdara 2018'an de dest bi greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger kir. Di 16'ê kanûnê de li girtîgehan grev hat destpêkirin. Di 1'ê adarê de jî ev grev li hemû girtîgehan belav bû. Piştî demek çalakî gihaşt asta herî jor û 30 girtiyan dest bi rojiya mirinê kir. Li Hewlêr, Strasburg, Galler, Mexmûr û Torontoyê jî bi sedan kes tevlî çalakiyê bûn. Her wiha 7 girtiyan jî li dijî tecrîdê çalakî pêk anîn û dawî li jiyana xwe anîn. Piştî peyama Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan ya 22'yê gulanê grev û rojiyên mirinê hatin bidawîkirin.



✓ Di hilbijartina 31'ê adarê ya rêveberiyên herêmî de tevî hemû astengiyan li 71 cihan HDP bi ser ket. Piştre jî bi hinceta KHK'î ne mazbatayên 6 hevşaredaran nehat dayîn û li şûna wan namzetê AKP'ê wekî şaredar hatin tayînkirin. Gelek şaredarî jî bi destê YSK'ê hatin xespkirin. Di 19'ê tebaxê de ewil qeyûm tayînî şaredariyên Bajarên Mezin ên Amed, Mêrdîn û Wanê kirin. Piştre gav bi gav qeyûm tayînî ser gelek şaredariyên din kirin. Heta niha bi giştî qeyûm tayînî 32 şaredariyan kirin û 22 hevşaredar hatin girtin.

✓ Li gorî daneyên Platfroma Em ê Kuştinên Jinan Rawestînin (KCDP) di 11 mehên ewil ên salê de herî kêm 430 jin hatin qetilkirin.

✓ Li gor dane û raporên sendîka û meclisên karkeran ên hatine amadekirin, di 11 mehên îsal de hezar û 606 karker bûn qurbaniyên kar.

✓ Bi beşdarî û piştgiriya 45 nûnerên rêxistinên civakî, partiyên siyasî û nerînên cuda li Amedê komxebata avakirina Tora Ziman û Çandan hat lidarxistin. Di civînê da biryara berfirehkirina Tora Ziman û Çandan û komxebateka berfirehtir hat girtin.

**Li Başûr raperîna Şeladizê**

Vê salê li Başûr gelek bûyerên girîng rûdan. Bûyerên girîng ên li Başûr qewimîn wiha dikarin werin rêzkirin:

✓ Li navçeya Şêladizê li dijî baregehên tirk ên leşkerî berxwedana gel pêk hat. Di encama berxwedanê de 4 welatî hatin qetilkirin.

✓ Piştî referandûm negihîşt armanca xwe Mesûd Barzanî dev ji erka serokatiya herêma Kurdistanê berda. Di 8'ê gulanê de bi dengê 89 parlamenteran zagona çalakirina serokatiya herêma Kurdistanê hate pejirandin.

✓ Di 17'ê tîrmehê de li Hewlêrê berpirsyarê MÎT'ê Osman Kose hat kuştin. Piştî bûyerê Wargeha Mexmûrê hat dorpêçkirin û hatin û çûyîn hat qedekirin.

**Li Rojava êrîş dewam dikin**

Li Rojava jî geşedanên polîtîk û leşkerî yên ku mohra xwe li salê dan wiha ne:

✓ Li hemberî Serêkaniyê û Girê Spî êrîşek dewleta tirk pêk hat. Di encama van êrîşan de 478 sivîl jiyana xwe ji dest dan, hezar û 70 sivîl birîndar bûn û zêdetirî 300 hezar sivîl ji gund û bajarên xwe derketin û koçber bûn.

✓ Sekretera Giştî yê Partiya Pêşerojê ya Sûriyeyê Hevrîn Xelef tevî 8 hevalên xwe bi awayekî hovane hatin qetilkirin.

✓ Di encama bomberana balafirên artêşa tirk a li hemberî Til Rifetê ya kantona Şehbayê de, di nav de 8 zarok bi tevahî 10 sivîlan jiyana xwe ji dest dan.

### Li Rojhilat xwepêşandan

Li Îranê û Rojhilatê Kurdistanê îsal krîza aborî, xwepêşandanên karkeran, lehî, kuştina kolberan, girtin û binçavkirina aktivîstan bûyerên herî sereke yên salê bûn.

✓ Di serê salê de li rojhilatê Kurdistanê zextên rejîma Îranê yên li ser aktîvîstan berdewam kirin. Di nav hefteyekê de li bajarên Sine, Kamêran û Bane yê ser bi Sine yên rojhilatê Kurdistanê 12 aktîvîstên siyasî û jîngehparêz hatin girtin.

✓ Di 5'ê çileyê de erdhejek navenda wê li bajarê Gêlan ê ser bi parêzgaha Kirmaşanê bû pêk hat. Li piraniya bajarên rojhilatê û başûrê Kurdistanê erdhej hate hîskirin. Li gor bîlançoya ku Zanîngeha Zanistên Bijîşkî ya Îranê di encama erdehejê de zêdetir ji 100 kesan birîndar bûn û ziyanek zêde ya madî bi xwe re anî.

✓ Bi destpêkirina biharê re li bajarên rojhilatê Kurdistanê lehiyek rabû û di encamê de zêdetirî 70 kesan jiyana xwe ji destdan û 768 kes jî birîndarbûn. Her wiha ziyanek mezin a madî jî bi xwe re anî.

✓ Li dijî bihabûna benzînê di 15'ê mijdarê de li bajarên Îranê û rojhilatê Kurdistanê xwepêşandan hat destpêkirin. Xetên înternetê hatin qutkirin, di êrîşan de bi sedan xwepêşandar jiyana xwe ji dest dan.

Ax! Welato
Ayhan Erkmen



# Gundê Qizilquleyê

**Li Qizilquleyê ciwan pir kêm in, dengê zaran hatiye birandin. Kal û pîr xemgîn in ji vê bêdengiyê. Xwaziliya xwe bi salê berîn tînin. Cihên wêran, nabin hêlîna tu kesan**

Ewrên spî û bedew, ên mija serê çiyayê Sîpanê Xelatê hilgirtî, bi ketina gund, me pêşwazî dikin; ji çiyayên Çemçê û Zixçiyê, li dû xwe hiştine û esmanê Qizilqulê yî çîk spî dineqişînin. Qasekî bi gundê Qizilquleyê re şa dibin û hêdî hêdî xwe dihejînin, ber bi Elegezê ve.

Gundê Qizilquleyê girêdayî navçeya Dîgora Qersê ye. Sînorê gund ji alî rojhilat ve digihêje ava reş; gundê Beyremkoma Xerab e. Ji alî rojava ve cîranê navçeya Dîgorê ye. Li alî bakur bi Bacelî û Mevregê û li alî başur jî bi Elem, Taşnîga Ecema û Dîgora Xerabe re cîraniyê dike.

Di sala 1882'yan de 23 malbatên êzidî yên ku ji herêma Eyntabê (Dutaxa Qerekosê) tên, li gundê Qizilquleyê bi cih dibin. Wê gavê li gund 190 kes dijîn; ji wan 102 kes mêr û 88 kes jî jin in. Gundî debara xwe bi xwedîkirina heywanan û çandiniyê dikin.

Êzidiyên hatine vir, ji eşîra Sîpkî û bi berên Ûtî û Çîlî ne. Navên çend malmezinên gund ên ku gihêştine roja me ya îroyîn ev in; Okiz û Bedoyê Mamo, Merûfê Okiz axa, Keleşê Xişo, Egîdê Şemo, Mûsoyê Casê, Silî û Îbrahîmê Temo, Celîl û Sêvdînê Osê, birangê Kemo û Çaçan û Rizgo ne.

Axatiya gund, di dema xwe de Okiz axa dike, li pey wî jî Merûfê kurê wî dewsa bavê xwe hildide.

Dema ku êla Sîpkiya, yê di sala 1882'yan de, ji Eyntabê bar bikin û bên xwe bispêrin ber bextê rûsan, ji bo destûrê bistînin, şandeyekê dişînin ba rûsan. Di vê şandeyê de Okizê Mamo jî heye. Heta li ser mêrxasiya Okizê Mamo stranek jî tê gotin;

*Siyarê Şapoş, bavê Merûf,*
*kekê Elîfê,*
*Berê xwe daye alî Ûrisêtê,*
*Êl û eşîr benda xebera wî ne,*
*Dibêjin eskerê romê ketiye te qîbata Siyarê Şapoş, bavê Merûf, kekê Elîfê,*
*Wey mala bavê min merûmê gelo ku man, çima nayên, her pênc mêrê Êzidxanê*

***Ji Elegezê heta Zixçiyê***

Fêza gund ber bi rojava girekî bilind heye. Li ser vî girî bi qasî barê 200 erebeyî, kevirên sor û çêkirî hene. Li gorî salixdayînan, demên berê li ser vî girî birceke bi kevirên sor çêkirî hebûye û gund navê xwe ji vê birca sor a di dema xwe da navdar bûye hildide. Mena sor bi tirkî qizil e. Birc jî Qule ye. Ji ber wê jê re dibêjin Qizilqule ango birca sor. Mirov dikare li birceke bi vî awayî bilind, ji çiyayê Elegezê heya çiyayê Zixçiyê çavdêriya hemû deştê bike.

Li ser gund, şikeftên pir mezin hene. Ya tê xuyakirin, di demên pir berê de ev şikeft wek avahî hatine bikaranîn. Ji ber ku şikeft xwezayî ne, behtir dişibin şikeftên çekirî. Kevirên wan antîke ne. Hema li bintara şikeftan dema ku mirov lingê xwe li erdê dixe, dengekî wisa jê tê, mirov hay dibe ku binî vala ye. Dibe ku li van deran jî şikeftên cuda hebin.

***Hespê herî cins Nîgar bûye***

Di bintara gund re çemê Dîgorê dikişe. Ev çem barê xwe ji çavkaniyên gundên; Zeynikê, Tirmaşînê, Emançayirê, Şîrînkoyê, Şatiroxliyê, Bazarcixê, Gulheyranê, Eylasinco û Dîgorê hildigire; kibar kibar di ser Qizilqulê, Mevregê, Baceliyê, Duzgêçîtê, Çataxê, Qerebaxê û Pakranê re dikişe, li vir tevî ava reş dibe. Serê salên 1900'î li ser vî çemî; yek li serê gundê Qizilqulê û yek jî li bintara gund, du aş hebûne. Yek aşê Teyo beg bûye, yê din jî aşê Markar axayê Ermen. Dîsa, li ser vî çemî, di gundê bintarê, Mevregê de jî, aşek hebûye. Dora vî çemî berê hemû bostan bûne. Rasta ber wê ya fireh jî, qada cirîtê bûye. Gundên der û dorê tên Qizilqulê û bi cirîtê dilîzin. Hespê Qizilquleyê yê herî bi cins, Nîgar bûye. Siwarê Nîgarê Celîlê Osê jî mêrekî li serxwe bûye. Lê niha cirît nayê lîstin, qada cirîtê bûye daristan, çanda danîna bostanan jî hatiye terikandin.

***Avahiyên gund dişibin hev***

Avahiyên gund hemû yek plan in. Oda mêvana, aşxane û li pêşiya wan hewliyeke piçûk heye, ji vir deriyekî piçûk jî, bi ser êxur re vedibe. Berayiya dîwaran dibe ku



ji ber sermayê ye, hema hema metreyek û nîv an jî du metre ye. Di banê aşxanê de kulekek heye, ev hem ji bo ronkayê tê bikaranîn, hem jî dûyê tendûra bintara xwe dikişîne. Tendûr jî; hem ji bo pehtînê, hem jî ji bo germbûnê tê bikaranîn. Kurnekî bi kevirê sor hatiye çêkirin û çar pênc dolim avê hildide jî, di aşxanê de ye. Ava kaniyan wê demê jî kêm bûye, ava çemê Dîgorê tînin û kurnan tijî dikin, av hem zelal dibe, hem jî sar dimîne. Li aşxaneyê di heman demê de bixêrikek jî heye û di hundirê bixêrikê de kuçik vêdixin û li ser vî kuçikî xwarin tên çekirin. Ser aşxaneya; bi daran û li qupekî hatiye avakirin lê li ser odeyê mêvanan bi textên birandî wek sindoqan hatine avakirin. Di odeya mêvanan de jî bixêrikek entîke heye. Kevirê wê, bi şiklê rojê û nîşaneya ebedê hatiye neqişandin. Dîwarê xaniyan ji hundir ve bi xerceke xweliya zer û kayê, hatiye sewaxkirin. Paceyên odeya mêvanan, hem ji bo ronkayê, hem jî ji bo germê berberoj in û piçûk in.

Her du keçên din Xezala Şemo û Şênêya Çaçan, ji gundê Qizilquleyê ne. Wan, ji şêniyên gund re behsa malbavistanên xwe û halê gund ê berîn kirine. Kîjan xanî yê kîjan malbatê ye, tê zanîn. Heta malbata ku, di mala bavê Xezala Şemo de bi cih bûye, dibêje ku; 'dema bêhna Xezalê teng bûya dihat ber derê me û di ser hîmê mala bavê xwe de digiriya.'

***Teyo li vî alî dimîne***

Kurekî Merûfê Okiz Axa, Teyo yê dozdeh salî jî di dema reverevê de li vî alî dimîne. Evdilmecît Beg lê xwedî derdikeve û ew li Qaqizmanê di gundê Pifîka Şêxa de bi cih dike. Mezin dibe û bi keçikeke wek xwe êzidî, bi Emînê re dizewice û dibe xwedî mal û hal.



***Casîmê Celîl û Xanima Rizgo***

Ev gund di heman demê de gundê Casîmê Celîl û hevjîna wî Xanima Rizgo ye. Her du jî di dema revereva 1918'an de; dê, bav û malbatên xwe di şer de winda dikin û di sêwîxaneyan de mezin dibin. Casîmê Celîl pêşengiya gelek karên bi nirx kiriye; vekirina Radyoya Rewanê, Enstîtûya Mamosteyên Zimanê Kurdî, beşa çapxaneya pirtûkên kurdî û hwd.

Xanima Rizgo jî jineke xwenda û wek navê xwe xanim e. Ev malbata kurdewar, çar jî ewledên wek xwe ku dilê wan tim bi welat û milletê wan re diavêje, mezin dikin; Ordîxanê Celîl, Celîlê Celîl, Cemîla Celîl û Zîna Celîl. Endamên malbatê bi şev û roj, wek akademiyê dixebitin. Bi hezaran stran, destan, çîrok, metelok û pêkenok berhev dikin û bi barê pirtûkxaneyekê, pirtûkan çap dikin.

## Helbesta Fêrîkê Ûsiv

Di dema revereva 1918'an de, sê keçên êzidiyan li vî gundî mane û mêr kirine. Ji wan Xezala Îvo ya gundê Emançayirê ye. Ew di heman demê de meta helbestvanê nemir Fêrîkê Ûsiv e. Fêrîk li ser meta xwe Xezalê helbestek jî nivîsiye;

*"Ez Xezal im,*
*Êzdiya Sîpikî, qîza Îvo,*
*Xûşka Hesen,*
*Xûşka Ûsiv,*
*Kevanîka Hesenîkê Cemaldînî. . .*
*Sînorçiyo, ez bextê te me,*
*Tu yê cabekê ji min re bînî:*
*Hesen sax e?*
*Ûsiv sax e?*
*Kidê sax e?*
*Gelo qe wan dera, nakin*
*Pirsa halê xayînga xwe?*

***Niha 30 mal mane***

Ji gundên Dîgorê yê herî pir koçber daye Qizilqule ye. Di gund de niha bi qasî 30 malbatî dijîn. Ciwan pir kêm in, dengê zaran hatiye birandin.

Kal û pîr xemgîn in ji vê bêdengiyê. Xwaziliya xwe bi salê berîn tînin. Pir dest nedane avahiyên berê, avahiyên sedsale hê jî li piya, lê bêxweyî û bêxudaniyê ew hejandine. Bêhna heznîtiya binaliyên berê ji wan tê. Cihên wêran, nabin hêlîna tu kesan.

Sed sal in, ji bo xizmetê li vîgundî kevirek nehatiye danîn. Bi xwe jî pênc kîlometreyan dûrî navçeya Dîgorê ye. Pirsgirêka gund a ava vexwarinê hê jî didome. Riya gund hê jî tune ye.

Lê dîsa jî bila riya we bi vî gundî bikeve. Ev gund, gundê bavû kalan e.

Ax! Welato



# Sersala we Pîroz Be

*Bi hêviya ku azadî, aştî, biratî, tendurustî, bextewarî û aramiyê bîne sersala 2020'an , bi taybetî li navçeya me ya dîrokî Farqînê li hemû gelên cîhanê yên mazlûm pîroz be...*

**Hevşaredarên Farqînê**
**û Endamên Meclisa Şaredariyê**

# Sersala we Pîroz Be

*Bi hêviya rojên xweş û azad em sersala gelê xwe pîroz dikin. Bi hêviya ku sala nû bi xwe re aştî, aramî û azadiyê bîne. Wekî dibêjin piştî tengasiyan firehî ye, em hêvî û daxwaz dikin ku piştî van rojên zor û zehmet rojên xweş bibin para we û piştî tengasiyan, firehî û xweşî riya we ronî bike. Em sersala we ji dil can pîroz dikin...*

**Pêkhateyên Platforma Ked û Demokrasiyê**

# Sersala we Pîroz Be

*Ma umud kenî ke serra 2020î biserkewtişê şaranê xoverdayoxan tacedar bibo. Ma bi nê umudan heme şaranê ke seba awankerdişê cuyêka demokratîke têkoşîn danî birêzdarî silam kenî û serra 2020î yê heme şaranê xoverdayoxan bimbarek kenî…*

*Em hêvî dikin ku sala nû ya 2020'an bi serkeftina gelên berxwedêr tacîdar bibe. Bi van hêviyan em hemû gelên ji bo avakirina jiyaneke demokratîk têdikoşin bi rêzdarî silav dikin û sala 2020'an li hemû gelên berxwedêr pîroz dikin...*

**Hevşaredarên Licê**
**û Endamên Meclisa Şaredariyê**

# Sersala we Pîroz Be

*Bi hêviya rojên azad û xweş em sersala gelên cîhanê û bi taybetî ya gelê xwe pîroz dikin. Di van rojên zor û zehmet de ji her tiştî û her demê bêtir hewcedariya me bi tifaq û yekitiyê heye. Bi hêviya ku sala nû bibe wesîleya tifaqa gelê kurd û rojên azad û aştiyeke bi rûmet bi xwe re bîne...*

Patnos BELEDİYESİ

**Hevşaredarên Patnosê**
**û Endamên Meclisa Şaredariyê**

# Sersala we Pîroz Be

*Em hêvî dikin ku sala nû li welatê me û cîhanê bibe wesîleya aramî û aştiyê!*

DİYARBAKIR TİCARET VE SANAYİ ODASI 1883

**Odeya Bazirganî û Pîşesaziyê**
**ya Amedê**

# Gelo no maslûb* Şêx Seîd o?

Îskender M. Selîm

Wendoxê erjayeyî verê verkan ma wazenê vajê wa weşanê rojnameyê Xwebûnî pîroz bo. Ma hêvîdar ê ke Xwebûn nê wextanê çetinan yê ke ma ti ra vîyarenê de mîsyonê xo bi serkewtişî bîyaro ca û emrê ey zafzaf derg bo. Seke şima zî zanê bi nameyê xo yo vilabîyayî û namekerdişê dewleta tirkan Serêwedaritişê Şêx Seîdî tarîxê kurdanê Bakurî de cayêko muhîm gêno. Babeta nuşteyê ma zî ey ra eleqedar o. La verê ke ma derbazê babetaxo bibê wazenê yew çiyî îzeh bikerê: Ganî ma amanc û qerakterê milî yê nê hereketî bîyarê xo vîrî û senî ke naye ra girêdaye çend tarîxnas yan zî cigêrayoxê kurdî zî wina name kenê ma zî nê hereketî ra vajê **"Serewedaritişo milî yê Kurdan yê 1925î."**

Heyf ke ser ra 94 serrî wext derbaz bîyo la ma hema zî derheqê Serewedaritişê Milî yê Kurdan yê 1925î de tayê detayanê muhîman nêzanê. Zanayîşê ke ma zanê zî qismê înan yan kêmî yan zî xelet o. Ma zî wazenê nê nuşteyê xo de bala şima biancê yew zanayîşê xeletî ser û hetanî ma dest ra bero raşta ey şima rê îzeh bikerê. Senî ke sernuşteyeyî ra zî dîyar beno merkezê babeta ma de Şêx Seîd Efendî esto. Hîna raşta xo ma do yew fotografo ke şarê ma mîyan de sey fotografê Şêx Seîdî yo ke badê şehîdkerdişê ey ancîyayo vila bîyo ser o vînderê.

Nê fotografî ra yew maslûb aseno. Yew kal o; yew kalo herdişsofî û vileyê ey hetê ey yê çepî ser kewte. Ewro hema zaf kurdî vanê qey (yan zî winî zanenê) no, bedenê Şêx Seîdî yo. Oxro ke no merdimo bêgan,serekê Cemîyetê Tealî yê Kurdîstanî (CTK) Seyîd Abdulqadîr o.

Seyîd Abdulqadîr (1851-1925), lajê Şêx Ubeydullahê Nehrî yo. Îdarekerdoxanê serewedaritişêkê kurdan ke bi nameyê pîyê ey name bîyo (Serewedarişê Şêx Ubeydullahî, 1880) ra yew o. Serekê CTK û ronayoxanê Cemîyeta Nêşr-î Maarîf yê Kurdan bî. Seyîd Abdulqadîrî nînan ra teber serekîya Şura-î Dewlete (manaya ewroyêne de Danıştay) kerda û o endamanê Ayân (Senato) bî.

Seke yeno zanayîş hereket û komelanê kurdan yê destpêkê seserra 20. de meylê xoserîye Şerê Dinya yê Yewinî ra pey dest bi averşîyayîşî kerd. Demêk ra pey Cemîyetê Tealî yê Kurdîstanî de sey otonomîstî û xoserîwazî di grûbî vejîyay meydan. Seyîd Abqulqadîr, eksê grûba xoserîwazan ke sereyê na grûbe Bedîrnanîyan antêne waştêne statûye otonomî bidîyo Kurdîstanî. Bi vatişêko bîn o pawitoxanê serekeyan yê fikrê otonomîstîye ra bî. Ey va: "Nê wextanê înan yê zoran de, derbe tirkan ro pirodayene munasîbê fehm û ferasete kurdîtîye nêbeno", vera peymana Sevrî vejîya û mudafayê tirkan reyde mucadelekerdişî kerd.

**Hedîseyê Mr. Templettonî: Delîlanê bihêzan ra yew o ke goya (qaşo) Serewedaritişê 1925î de engişta îngilizan esta û dolaba ke seba ke Seyîd Abdulqadîr serewedaritişî ra eleqedar bero nîşandayene û bero tesfiyekerdiş ameya plankerdene.**


Metîn Toker, rojnamegeranê namdaran yê demêk o û eynî wext de zamayê Îsmet Înonuyî yo. Kitabê Metîn Tokerî *Şeyh Sait ve İsyanı* (Şêx Seîd û Serewedaritişê Ey) ke ey 1964 de weşanayo, hetê sernuşteyê ma yê corênî ra muhîm o. Beşêkê nê kitabî de pêvînayîşê Serekê Cemîyetê Tealî yê Kurdîstanî Seyîd Abdulqadîr û embazanê ey û bi nameyê "Mudirê Umur-ê Nezaretetî yê Wezaretê Karanê Teberî yê Îngilizstanî Mr. Templettonî Nîzamettîn Begî ke eslê ci de o îstîxbaratê tirkan ra yo ser o yeno vindertiş. Kesê ke no hedîse [na dolabe] Tokerî rê qisey kenê Korgeneralo teqawut Ekrem Baydar o ke o tarîx de Mudirê Asayîşî yê Îstanbulî yo û tercumananê îngilizkî yê Mudirîya Teşkîlatê Polîsan yê Îstanbulî ra Mustafa Necîp Emre yê. Goreyê naye Îstîxbaratê Tirkan amadekarîya serewedaritişî 5 aşmî (mengî) verê ra, payîzê 1924î de xebere girewta. Teşkîlatê polîsîye ra Nîzamettîn Begî, înanê ke amadekarîya serewedaritişî kerdêne mîyan ra Kor Şadîyo Paliyijî reyde têkilîroneno û xo ey rê sey Mr. Templetton dano şinasnayîş.



Şêx Seîd



Seyîd Abdulqadîr



Heyf ke ser ra 94 serrî wext derbaz bîyo la ma hema zî derheqê Serewedaritişê Milî yê Kurdan yê 1925î de tayê detayanê muhîman nêzanê. Zanayîşê ke ma zanê zî qismê înan yan kêmî yan zî xelet o. Ma zî wazenê nê nuşteyê xo de bala şima biancê yew zanayîşê xeletî ser

Metin Toker wina qal keno: "Pêvînayîşê Nîzamettîn û Abdulqadîrî qaso ke bibo babeta romanan çiyêko şenayî yo. Seba ke serkomîserî îngilizkî nêzanayêne la zaf weş teqlîdê îngilîzkî kerdêne ganî yew keso ke îngilizkî zanayêne bidîyêne ey het. Nîzamettîn muxatabanê xo yê ke sewîyeya înan zî sey ya Kor Şadî bîye reyde bi "Tirkîya Lorel-Hardî"** qisey keno, û hewceyîya ey bi yewna kesî nêbeno. Feqet şert bî ke qiseykerdişê ey û Mîrê Kurdîstanê Mustaqîlî bi hawayo ehemîyetin derbaz bibiyêne. Teknîk no bî: Nîzamettînî do sey teqlîdê îngilizkî çî-mîyan bivatêne. Tercumano ke ey het de bî do zî ê biçarnayêne tirkî ser. Seyîdî [Abdulqadîr] o cewabê xo bi tirkî bivatêne. Nîzamettînî do helbet no fehm bikerdêne la ey do fehmkerdişê xo bellî nêkerdêne. Tercumanî do vatişê Seyîdî seba Nîzamettînî goya bi îngilizkî tekrar bikerdêne. Nîzamettînî –yanî Mr. Templettonî- do reyna bi teqlîdê îngilizkî cewabê ney bidayêne. Mudirê Polîsan Ekrem Begî, 'Mr. Templetton' û tercumanê ey rê çîyê ke ê bivajê tek bi tek dayî talimkerdêne. [R. 55.-56. yê kitabî ke nameyê ey cor ra vîyareno.*** Î.M.S.]

Yew şexsîyeto ke wextanê înan yê tewr zoran de fikrê tirkan reyde mucadelekerdişî mudefa kerdo û manaya ewroyêne de meseleyê kurdan rê çarçewaya welatê hemparî de çareserkerdiş pêşnîyaz kerda rê çi dolaba adîye ameya sexnekerdene. Mêrdim çi vajo tay maneno, la şima hende bizanê ke çend rojnamegeran û akademîsyenanê tirkan nuşteyanê xo de pê îftixarî behsê nê hedîseyî [na dolabe] kerdo. Helbet goreyê înan "hîle û dolabê winasî huner o, her milet nêeşkeno heqê nê tewir karan bido"

Seyîd Abdulqadîr qerarê Mehkemeya Îstîqlalî yê Şarqî ke badê Serewedaritişê Milî yê Kurdan yê 1925î ronîyaye ser o 27 gulane 1925 de (74 serreyîya xo de) Dîyarbekir de ame îdamkerdiş. Ser ra zî ey "Verê çimanê mi de xapa îdamî bierzîyo vileyê lajê mi ro ez naye rê deyax nêkena" vato û rica kerda ke ey verê lajê ey îdam bikerê zî seba ke bibo şahidê îdamkerdişê ey, badê lajê xo ameyo dardekerdiş.

Goreyê neqilkerdişê Garo Sasunîyî, vatişê Seyîd Abdulqadîrî yê peyênî nê yê: "Xora veşnayîş û xirabekerdişî de şohretê şima yo gird esto. Şima tîya zî açarna Kerbela. Naye bizanê ke bi dehşet û îstîsmarkerdişê bêînsafî şan û şeref nîno qezenckerdiş."

**Fotografê Şêx Seîdî yo Peyên**

Şima mîyanê nê nuşteyî ra fotografê Şex Seîdî yo tewr peyên o ke badê îdamkerdişê ey ancîyayo vînenê. Çimeyê nê fotografî ke ma bi xo o dîyo no yo: İsmail Talman, "Şeyh Sait İsyanı, Resimli Tarih Mecmuası, Sayı: 17, Cilt: 2, İstanbul, Mayıs 1951, s. 729-731. Derheqê nê fotografî de yew anektod zî wina yo: Ma no fotoğraf çimeyo ke ma hûmara 11. ya rojnameyê Azadî de (1992, r. 5) dî. Fotografî ser o zaf çî vatiş îcab nêkeno û xora derheqê ancîyayîşê ey de hema-hema ke tu zanayîşê ma zî çin o. Seba ke babeta mara eleqedar o,baş beno ke ma madeya "Şeyh Sait İsyani" yawww. tarihiolaylar.comî ra paragrafê tewr peyênî neqlê cêrî bikê:

"Verê ke qerarê mehkeme yê derheqê Şêx Seîd û embazanê ey de bero girewtene layî, qelasî û sewbîna melzemeyê ke seba daranê îdamî luzum bîyêne amebîy girewtiş û depo de ronîyabîy. Bê nînan celadê ke do nê îdaman tetbîq bikê garnîzonê leşkerî de amebîy mêmankerdene. Şewdirê 29 hezîrane 1925 roja yewşemeyî, hema ke Şêx Seîd û embazê ey nêvejîyê mehkeme, qezaya Berê Koyî yê Dîyarbekirî de vengê çakuçan, birrekan û hurakan ameyêne. Seba ke darê îdamî ke amabîy amadekerdiş nîzamî bibê yanî eynî dergîye de bê bi birrekan ameyêne birnayîş. Seba ke mêmanî, cinî û domanê înan yê ke Anqara ra amey temaşeyê merasîmê îdamkerdişî bikerê, duştê (hemverê) sêpîyanê îdamî de trîbun ameyêne înşakerdene. Gama ke qerarê mehkeme ame eşkerakerdiş sêxpîyê îdamî amebîy amadekerdene la viraştişê trîbunî dewam kerdêne. Her çî ke ame amadekerdiş, nêmeyê şewe de merasîmê îdamkerdişî û ameyîşê temaşekerdoxan dest pêkerdî. Şêx Seîd û embazê ey hepisxaneyî ra bi hewayo zincîrkerdeameyî ardene. Tek bi tek îşligê sipîyî dîyay xora û ameyî îdamkerdene. Şêx Seîd bi sereyo tîk vejîya û bê ke bilukimîyo vejîya sêpîya îdamî ser. Nê metanetê Şêxî ra gelek nuşteyanê rojnamegeranê tirkan û xerîban de ameyo behskerdene."

**Herinda Peynîye de**

Kolonyalîstî seba ke înan de şuurê milî awan nêbo her tewir polîtîqayan tetbîqê miletanê bindestan kenê. Nê polîtîkayan ra yew zî no yo: Zanayîş û dokumentê (belgeye) ke tarîxê înan ra eleqedar ê çin yan zî tahrîf kerdena înan, derheqê lîderanê serewedaritişan yê înan de îfadeyanê tahkîr û tezyîfkerdişî xebitnayene û bi no hewa çimê miletê înan de îtîbarê înan warodayîş û bêşexsîyetkerdişê înan. (sey nimûneyêk: tabîrê heqaretamîzê ke xeberanê rojnameyanyê ke wextê serewedaritişan û mehkemekerdişêînan de derheqê lîderan û hereketanê înan de vejînê) Polîtîkaya ke her tewir krîteranê exlaq û wicdanî ra zî dûrî ya û herhal de dinya de emsalê aye çin bo zî na ya: Îdamkerdişê înan ser ra bi des serran wext derbaz bîyo la na dewlete hema zî cayê mezelanê Şêx Seîdî, Seyîd Rizayî yê embazanê înan eşkera nêkerdî.

Ma, Şêx Seîd û heme şehîdanê Hereketê Milî yê 1925î û heme şehîdanê Kurdîstanî bi minet û rehmet yad kenê û wina vanê: Ma kurdî berpirsîyar (mesul) ê. Berpirsîyar ê ke reberanê serewedaritişanê netewa xo, roşnvîranê xo yê ke seba kurdîtîye xebitîyayê weş bişinasnê. Înan azanê (neslanê) newîyan rê bidê şinasnayîş. No eynî wext de înan rê deynê ma yê minetî yo. Peynîya nê nuşteyî ke ma o seba nê amancî nuşto de vanê **kozireyê kurdîtî yê zerrîya xo** muhafeze bikerê.

****Keso ke bi dardekerdiş ameyo kiştene***

*****Tirkîya temaşe ya ke dublajker Ferdî Tayfurî vengpêdayîşê filmê Laurel û Hardy'î de xebitnaya.***

****** Qismê tirkî yê nê nuşteyî hetê ma ra çarnîyayî kirmanckî ser.***



# Qet behsa guh neke

Lawikekî bê ar bi diya xwe re çû mala xaltîka xwe. Xaltîka wî nû zarokek jê re çêbibû lê feqîro bê guh bû.

Diya lawik di rê de jê re got ku em çûn mala xaltîka te rihet rûne, xwe fehşo mehşo neke û qet û qet, nebî nebî tu behsa guhê zarok bikî wê dilê xaltîka te ji me bimîne.

Dîsa diya Şêro jê re got tu qet behsa guh miha nekî wê xaltîka te xemgîn bibe.

Şêroyê me got ma ez dînim temam ez qet behsa guhan nakim.

Nû gihan mala xaltîkê, dayikê ji lawê xwe re got tu jî biçe destê xatiya xwe.

Lawik çû li kêleka xaltîkê xwe rûnişt û jê re got:

**Şêro:** Derbasî be xaltîkê çavê we ronî be, divê hûn baş guh bidinê, gelekî zeîf e.

**Xaltîk:** (bi xemgînî) Tu sax bî berxê min.

**Şêro:** Ya herî girîng hûn gelekî ava gêzeran bidin wî, ji bo çavê wî xurt bibin.

**Xaltîk:** Çav ne pirsgirêk e zêde zêde em ê jê re berçavkan deynin.

**Şêro:** Jixwe teşqele di wir de ye xaltîî, ma ka wê pepûko çawa bikaribe berçavkê bikar bîne, wê berçavk çawa bisekine...

# Bila xêra dê û bavê min be

Berê etar li gundan digeriyan û şekir û benîşt û lazimatiyên malê difirotin gundiyan. Carekê dîsa etar bi ereboka xwe ya li paş bergîl ve hat gundekî û bang kir: Werin şekiran, werin nokan, werin firingiyan, petatan, werin tirî...

Helîmo jî yekî gundî bû. Helîmo bi gewdê xwe wekî hîmekî bû, mirovekî qerase bû. Dikaribû çar zilaman bixe bin çengên xwe yên efsanewî. Mirovekî gelekî bihêz bû lê bêrîka wî vala bû.

Gundî li etar civiyan û her yek çi jê re lazim bû kirîn. Helîmo jî di nav gundiyan de xwe gihand ba zilamê etar.

Helîmo ji etar re got ka hinek nok bide min ez ê paşê pera bidim te. Lê etar qebûl nekir. Helîmo kir û nekir etar nok nedan Helîmo. Dema ku etar xwest ji wir here, lingê xwe li bin zikê bergîlê xwe da lê Helîmo ji paş ve bi teriya bergîlê wî girtibû. Bergîl û etar kirin û nekirin nikaribûn ji destê Helîmo bifilitin.

Rabû Etar neçar bû û got bela te li te bikeve heyra ha ji te re nok bera xêra dê û bavê min be. Helîmo jî got wele heke bergîlê te karîba bimeşiya te nok ne didan lê de bera xêra dê û bavê te be.






# Parvekirina temenan

Ji kerê re hat gotin, tu yê bê rawestan ji sibê heta êvarê barên giran li pişta xwe bikî, tu yê ji aqil bê par bî û tu yê 50 sal bijî. Kerê got 50 sal gelek e, tenê 20 salan bidin min. Temenê wê bû 20.

Ji kûçik re gotin tuyê parastina mirovan bikî û tu yê hevalekî baş bî ji insanan re û wê temenê te 30 sal be…kûçik got gelek e bila tenê 15 sal be... temenê wî bû 15.

Ji meymûn re gotin tu yê xwe ji darekê bavêjî yeke din, tu yê laqirdiyan bikî û kenê mirovan bînî. Temenê te jî wê 20 sal be. Meymûnî got gelek e. Tenê min 10 sal divê. Temenê wî bû 10 sal.

Dora mirovan hat. Gotin tu yê afrîndeyê herî bi aqil bî. Tu yê bi aqilê xwe her tiştî bixî bin serweriya xwe û ji xwe re bikar bînî. Temenê te jî wê 20 sal be. Mirovan got ev temen hindik e. Ez 30 sal ê ji temenê kerê zêde ma, 20 ê ji temenê kûçik û 10 ê ji temenê meymûnî ma jî dixwazim. Lewre temenê mirovan wiha direj bû.

20 salan wekî insan dijî piştre dizewice.

30 salî wekî kerê dijî, barê giran li ser milê wî ye, piştî ku zarokê wî mezin dibin.

15 salan wekî kûçik dijî guh dide malê û çi didin ber wî dixwe. Paşê kal dibe.

10 salan jî wekî meymûn dijî. Ji malekê diçe malekê, ji mala kur dişînin mala keçê û dibe pêkenoka neviyên xwe.



Kewê

Yildiz Gultekîn

# Ava mezin

Ez teze gihîştime, hê ciwan im, di nav laşê min de kelecanek wisa heye ku ez jî nizanim çima... Bihara ewil e, gul û gupik hêdî hêdî dibişkivin, ez jî xwe weke wan gul û gupika dibînim. Berfa li ser erdê, dema roj hiltê, ew berf jî ber bi danê nîvro ve dihele, ew helandina berfê jî evîndariyekê dike nav dilê min.

Carna ez xwe bi xwe difikirim "gelo ez du dilî an jî sê û çar dilî me? Gelo hemû keçikên di emrê min de jî du dilî ne?" Na bawer nakim, eva ez im û ev jî taybetmendiya min û xweşikbûna di rengê biharê de girêdayî ye ewqas.

Dema ez di nav van xeyalan de bûm, rojekê diya min û bavê min gotin em diçin bajarekî mezin, negotin diya min nexwaş e, gotin em diçin gerê. Ez fikirîm dema gerê û dîtina bajarê mezin nîne, ger ew berê xwe bidin wî bajarî, wê kî li wan heywanên nû zane binêre û wan bi av û alif ke!

Ev fikarên min paşê pir dereng hatin bîra min, wê demê min fêm nedikir ka wê çawa bin. Lê dîtina bajarekî mezin ez xistim nav xeyalên mezin. Mirovên cur bi cur, kuçe û kolanên mezin, xaniyên mezin û bihareke bi rengekî din. Min xwe kir qîr û sîr, min got ez ê jî bi we re bêm wî bajarî, gotin; na nabe, kes li malê û heywanan ji te baştir xwedîtî nake, em herin û werin, careke din bi serê bavo em ê te bişînin wî bajarî.

Teeew, dema got; serê bavo û sond xwarin, min dizanî heta sê û çar salan ez wî bajarî nabînim. Bi kelegirî ez di cihê xwe de mam û ew çûn.

Di vê navberê de, piştî ku ew çûn, min bi wê hêrsa xwe ya mezin, ew heywanên ku avis bûn min hemû zayandin, mêjokê wan li ber soba kerma xwedî kirin, hemû der û cînar li ber karê min, xwedîderketina mal û heywanan metel mabûn, ez her dixebitîm, min ji tu kesekê alîkarî nexwest. Piştî çend rojan dê û bavê min vegerîyan malê, lê ew vegereke bi rûpirçî bû, herduyan bi hevra xeber nedidan, bavê min nan nedixwar, tenê tûtina xwe dipêça û bi zikê birçî dikişand, her sibe diya min hêkek dilmeyî dida wî lê, bavê min devê xwe pê nedikir.

Piştî çend roj şûnda, em li ser sifreyê taştê dikin, diya min dîsa hêka dilmeyî dirêjî bavê min kir û got; “Tu bi serê bavo kî qey ne baş bû ku me lingê xwe li ber ava mezin şuşt?” Bi vê gotina diya min re, bavê min bi hêrs vegerîya got; “Erê erê baş bû, te tenê lingê xwe bişûşta ez razî bûm, lê te li ber wê ava mezin, li pêşberî min û qet der û dora xwe nenihêrî, xwe avête nav avê, ew bayê avê jî dêrê te bilind kir, dûra çi bû?”

He, du re çi bû?, “Dema dêrê te li ber bayê ket, qûna te derket derva, ka bifikire, ger ez û tu li wê derê tenê nînbûna, hinekên din jî li wir bûna, wana jî qûna te didît.” Got û ji ser sifrê rabû. Diya min jî rabû û çû destê wî girt û got; “Ne malmîrat, qey aqilekî min jî heye, ez jî dikarim bifikirim, min jî dît ku kesek li wan deran tune ye, ez û tu bi tenê ne, lewma min xwe avête nav wê ava spî, çi ye, çi bûye qey! Mêrantîya te ji jintîya min çêtir e! tu jî ketî û ez jî ketim nav avê! Careke din jî ez bi te re naçim ti deran.”

Wisa ji hev xeyidîn, dema danê êvarê bavê min di destê wî de tûrikek da diya min, me hemûyan serê xwe li ber derî raderxist, bi dizî li wan dinihêrî, di nav wî tûrikî de pirtî yên gulgulî û pazên weke ku diya min ji xwe re derpiyên pazen bidrû, wê derpîyên pazên hez dikir.

Lê wê ava sipî jî evîndarîya wan mezin kiribû. Gelo ew ava mezin li ku derê bû! Ew av pir nêzikî me bû lê haya me jê tunebû, ava mezin "Behra Wanê" bû.

# Deng beyana hebûnê ye

Zeynep Durgut / WAN

> Nivîskar Rengîn Kardelen got ku qedexekirina pirtûkan tirsa li hemberî zanînê ye û li gel qedexekirina pirtûkan jî gel dixwaze xwe bigihîne wan pirtûkan. Kardelen destnîşan kir ku deng beyana hebûnê ye û ronahî mizgîniya cîhana alternatîf e

Dijberiya li hemberî rastiyê ya desthilatdariyê rehên xwe dispêre dîrokeke dûv û dirêj. Di her serdemeke dîroka mirovahiyê de pêkan e ku mirov bi mînakên cur bi cur vê raxe ber çavan. Hemû hewlên mirovahiyê yên ji bo ronîkirina serdema heyî, ji vegotina çîrokekê, heta tabela yan jî wêne û pirtûkek her rastî astengî û qedexeyan hatine.

Ji avabûna komara Tirkiyeyê heta niha gelek pirtûk hatin qedexekirin û nemaze jî di van salên dawîn de qedexe û sansûr careke din ket rojevê. Têkildarî qedexe û berhevkirina pirtûkan em bi nivîskar Rengîn Kardelen re axivîn.

**Bi çavên xwe yên zarok**

Rengîn Kardelen bi bîr xist ku di zarokatiya wê de pirtûk û kasetên kurdî ji ber qedexeyan dihatin veşartin û binaxkirin û wiha axivî: "Di darbeya 1980'yî de li mala me ya bajêr ez bi çavên xwe yê zarok şahid bûm û min dît ku hemû pirtûkên me ji aliyê diya min û dapîra min ve bi rojan û yek bi yek hatin şewitandin. Rastiya li paş ew tabloya bi navê 'Qetla Pirtûkan' bû."

**Mizgîniya jiyana alternatîf**

Kardelen destnîşan kir ku desthilatên heyî bi êrîşkirina li dijî 'zanînê' re dixwazin civakê ji rastiyan bêpar bihêlin û her wiha ji deng û ronahiyê ditirsin û ev nirxandin kir: "Deng hebûn e. Weke bikêrekî beyana hebûnê ye. Mirov tev li yên heyî dike. Ronahî, jiyana alternatîf û mizgîniya cîhana alternatîf e. Ango sembola ronîbûn û serwextbûnê ye. Desthilatdarî dema ku li tarîtî û tiştên wêdetirî tarîtiyê nihêriye, herî zêde ji pirs û lêpirsînê tirsiyaye."

**Tişta herî hêja xwendin e**

Kardelen diyar kir ku ji bo pêşketina civakê tişta herî hêja xwendina pirtûkan e û wiha got: "Li gel qedexekirina pirtûkan gel pirtûkên ku dixwaze bixwîne nikare xwe bigihijînê. Îro em giştî di pêvajoyeke wisa de derbas dibin ku divê li serê lêkolîn bê kirin. Dibe ku ji pirsa em çi dixwazin bêhtir a em dixwazin veguherin çi ji xwe û ji hev bikin. Bi sazîbûnê hêza xwedîderketinê, bi vê yekê re xurtkirina civakê baştirîn çareserî ye."

**Bêyî ku hevokên xwe bitewîne**

Nivîskar Kardelen da zanîn ku divê hewldanên ji bo xwendin û pêşvebirina zimanê kurdî zêdetir bibin û di dawiya axaftina xwe de ev tişt anî ziman: "Tişta ku bê kirin ew e ku li hemberî zordestiya desthilatdariyê xwe bispêre hêza civakê û bêyî ku hevokên xwe bitewîne û peyvên xwe biquşîne rasterast gotina xwe li her derê bêje. Ya herî girîng divê em xwe û civaka xwe ji aliyê çand hûner û ilmê ve bi pêş ve bixin û di tarîtiyê de nemînin. Divê em civaka xwe û rewşenbîr û bîrmendên xwe bigihînin hev û pirek xurt ava bikin. Divê em şoreşa ziman pêk bînin. Ji zimanê xwe hez bikin, ya ku me xelas bike ev e. Ger em ji zimanê xwe hez bikin em ê ne tenê pirtûkên xwe, hemû tiştên xwe yên pîroz ji hemû nebaşiyan biparêzin."



## Her berhemek hîmê hebûnê ye

Nivîskar Rengîn Kardelen li hemberî zordestiya desthilatdariyê bal kişand ser girîngiya wêjeyê û wiha got: "Her berhema di warê çand û hunerê de xwe digihîne xwînerên xwe kevirekî li hîmê civaka kurdan û hebûna wan zêde dike. Ew tişta ku xwestek û planên serdestên me yên ji bo tunekirina me hatine sazkirin têk dibe, wêjeya me ya devkî ye. Berhemên bi kurdî hatine nivîsandin derbeyên herî mezin in li siyaseta wan a înkar û asîmîlasyonê. Tunekirina deng û sewta dengbêjan bi rêya qedexekirina kasetan bi ser neket, deng û sewta wan a têr û tije xwe di rûpelên pirtûkên qedexekirî de dan der."

## Di hejmara nû de cih da amatoran




Hejmara çaremîn a xêzekovara bi kurdî "Zrîng" derket. Kovar bi zaravayên kurmancî û kirmanckî tê çapkirin û ji 32 rûpelan pêk tê. Zrîngê di berga yekemîn a kovarê de cih daye peyamên ji bo sala nû.

Kovar di hejmara 4'emîn de bi dewlemendiya xwe balê dikişîne. Her wiha di vê hejmarê de Dogan Guzel, Ender Ozkahraman, Eşref Mûmcû, Bunyamîn Karakoç, Îmam Cîcî û Ronî Battê xêz kirine. Di vê hejmarê de xêzkar Eceren û Kemal Gokhan jî cih digirin. Ozgur Amed û Terstaqla Reco jî bi nivîsên mîzahî rengîniyê dane kovarê.

Zrîngê di hejmara nû de ji bo xêzkarên amator rûpelek veqetandiye û cih dide xebatên amator jî. Armanc ew e ku kovar rola dibistanê bi cih bîne û xêzkarên nû bigihîne.

Li aliyê din 2 meh in kovar li hemû bayiyên Kurdistanê û Tirkiye tê firotin. Ev demek e kovar li Almanya, Swîsre, Parîs û Londonê tê belavkirin û li Ewropayê jî xwendevanên kurd eleqeyeke baş nîşanî kovarê didin. *AMED*

# Li Êlihê Rojên Wêjeya Kurdî

NAVENDA NÛÇEYAN

Di 22'yê kanûnê de bi pêşengiya Şaredariya Êlihê, Şaxa Egîtîm Sen a Êlihê, Komeleya Çand û Hûnerê ya Êlihê (BART) û Komeleya Lêkolînên Ziman û Çandê ya Meretoyê, li Navenda Çand û Hunerê ya Ahmet Guneştekîn a Şaredariya Êlihê, 2'yemîn Rojên Wêjeya Kurdî dest pê kir. Bername di 29'ê kanûnê de bi dawî bû. Di çarçoveya bernameyê de gelek nivîskar, helbestvan û wêjevanên kurd berhemên xwe pêşkeş kirin û wêjeya kurdî nirxandin.

Di roja destpêkê ya bernameyê de hevserokên DBP'ê Salîha Aydenîz û Keskîn Bayindir, parlamenterên HDP'ê, hevşaredarên Êlihê Mehmet Demîr û Songul Korkmaz û ji Berken Bereh heta Mueyed Teyîp, Îrfan Amîda, Selîm Temo û Roza Metîna, gelek nivîskar û helbestvan jî amade bûn.




Mêvanê rûmetê yê Rojên Wêjeya Kurdî yê îsal, helbestvanê kurd Berken Bereh bû. Di destpêka bernameyê de Şeva Rêzgirtinê ya ji bo Bereh hate amadekirin. Hevşaredar Mehmet Demîr di şevê de axivî û got ku wan ji bo xwedîderketina li çanda kurdî, sond xwariye. Salîha Aydenîz jî bal kişand ser çand û zimanê kurdî û wiha got: "Bi salan e zimanê kurdî di bin zext û qedexeyan de ye. Em deyndarên helbestvan, dengbêj û nivîskarên xwe ne ku heta roja me ya îro zimanê me bi pêş xistine."

**Dema başûrî dikenin…**

Yek ji mijarên ku beşdaran di bernameyê de bal kişand ser jî yekitiya neteweyî ya gelê kurd bû. Ev mijar ji hêla helbestvan Mueyed Teyîp ve bi gotina; 'Dema li Başûr kurd dikenin, li Bakur jî kurd dikenin' hate nirxandin. Piştî axaftinan jî nivîskar Selîm Temo, Weysel Tirpan, Roza Metîna, Merdan Newayî jî helbestên Bereh xwendin.

Piştre jî helbestvan Berken Bereh derket ser dikê û da zanîn ku dema dest bi nivîsandina helbestan kir, kurd di bin zext û zilmeke mezin de bûn. Bereh diyar kir ku ji wê rojê ve îradeya gelê kurd nehat şikandin û wiha dom kir: "Divê her kes girîngiyê bide çand û zimanê xwe. Dema hûn zimanê miletekî tune bikin û ji holê rakin, ji wî miletî tiştek namîne. Ji ber vê yekê dema cara ewil qeyûm hatin dest bi daxistina tabelayên kurdî kirin." Piştî axaftina Bereh jî parlamenter Feleknas Uca plaket diyarî Bereh kir.

Piştî axaftinan jî bername bi nîşandana fîlman, xwendina helbestan û bi gotûbêj, panel û îmzeyan dom kir. Di gotûbêj, panel û guhdarkirinan de mijarên weke 'Pêşketina çîroka kurdî', 'Di wêjeya kurdî de werger', 'Rengê jinê yê di wêjeya kurdî de', 'Di zaravayên kurdî de roman' û 'Motîvasyon û pirsgirêkên romana kurdî' ji hêla nivîskar û helbestvanan ve hatin nirxandin.




# Ferhengeke din li kurdî zêde bû


Ferhenga Têgihên Hiqûqê bi resepisyonekê li navenda baroya Amedê li Eywana Konferansê ya Tahîr Elçî hate danasîn. Ferhenga Têgihên Hiqûqê beriya 4 salan bi beşdariya gelek hiqûqnas û zimanzanên kurd û bi hevkariya Baroya Amedê û Weqfa Mezopotamyayê hate destpêkirin. Ferheng ji aliyê Weqfa Mezopotamyayê ve hatiye çapkirin û bi resepisyonekê li Eywana Konferansê ya Tahîr Elçî ya Baroya Amedê hate danasîn. Resepisyon roja çarşemê saet di navbera 16.00-18.00'an de bi tevlêbûna gelek nivîskar, zimanas, parêzer û heskiriyên zimanê kurdî pêk hat. *AMED*

# xwebûn

30 Kanûn 2019-5 Çile 2020 / e-mail: rojnameyaxwebun@gmail.com / Buha: 4 TL Hejmar: 2

***İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:*** Kadri Esen
***Sorumlu Yazıişleri Müdürü:*** İdris Gürmez
***Yayın Danışma Kurulu:***
Abdulla Peşêw
Ehmed Huseynî
Kakşar Oremar
Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev
Selîm Temo
Dr. Zerdeşt Haco

***Yönetim Yeri:*** Kooperatifler Mah. Gevran Cad. Akkoyunlu No: 5/13 ***Yenişehir / Diyarbakır***
***Baskı:*** Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı ***Bağlar / DİYARBAKIR***



**Weswese 2**

**Şener Ozmen**

## Hevkariyên hunerî

Dibe ku hûn jî lê rast hatibin û we jî xwendibe, hinek ji we ew bi çavê serîyan jî dîtibe, ku çendekî berê bi boneya *Konferansa Merqeyê* ya li *Qesra Çiraxanê* (Stenbol) li dar ketî, sûrprîza dawîn a hunermendê navdar *Xelîl Altindereyî* (Dêriş, 1971) wekî hemû kar û barên wî yên bi vî rengî (çi fotograf, çi peykerên ji şimayê, çi vîdeo û enstelasyon) bo kurtemaweyekê bûbû mijara rojevê, helbet bi tenê di qada hunerê de. Enstelasyona ku ji lîmûzîneke polîsan –polîsên tirk– pêk hatibû, di hewşa qesrê de û li binfêza pêpelûkên qesrê hatibû bicîkirin, ji bo vexwendiyên girîng ên ji cîhana karî, bo giregirên medyayê, koleksîyonerên bi nav û deng û bêguman –nexasim– ji bo sergerînendeyê *MoMAyê* (Mûzeya Hunera Modern a New Yorkê) *Glenn D. Lowryî* ku wekî girîngtirîn mêvanê çalakîyê hatibû bilêvkirin, pêşwazî û jesteke metelhêl bû. Belam nîqaşên ku bi dû vê enstelasyonê –çi di medyaya civakî de û çi di malperên hunerî de– belav bûbûn, bo nifşên hunerî û rexneyî bûbûn sedema hişlihevqelibîneke jî. Altindere yê ku di destpêka salên 90'î de, bi berhemên xwe yên tabûşikên û bi helwêsta xwe ya *avangart* a ku ew bi dijberîya mîlîtarîzmê, nijadperestiyê, zayendperestiyê û hemû kir û kiryarên dermirovî yên desthilatê bi nan û av dikirin, li cîhanê gişî hatibû naskirin, sî sal bi şûn de bi lîmûzîneke polîsan û li Qesra Çiraxanê derketibû rastê.

Ji bo bibîrxistinê; di *5. Bîenala Stenbolê ya Navnetewî* de (Kurator Rosa Martinez, Stenbol, 1997) Xelîl Altindere, bi enstelasyona xwe ya fîtker (*Reqsa Bi Tabuyan Re–II*) –ku ji çend pênaseyên cihê yên hunermênd hatibû pê– û bi wênesûretê Ataturkî yê li ser 1 mîlyonê baqnot ê wê demê ku Atatûrk rûyê xwe bi kefa destên xwe –heye ku ji şerman– nixumandibû, zû bi zû ketibû devê tifinga nijadperestan.

Her weha bi berhema xwe ya bi navê *Hûn Bi Xêr Hatin Welatê Windayan* [1] (Pûlên Çapkirî, 1998) ku ji wan kesayetên di henga binçavkirinê de hatibûn kuştin ên wekî *Hasan Ocak, Ridvan Karakoç, Fehmi Tosun, İbrahim Gundem, Bedri Algan, İkram İpek, Huseyîn Morsumbul, İsmaîl Bahçeci, Talat Turkoğlu, Ali Efeoglu û Fahrettin Eren*, dîsan di sala 1996'an de, enstelasyona me ya hevpar a ji dosyeyên kinûşk ên dewletê ku bi tîpên girdek li ser T.C. HUKUMETÎ dinivîsand, ku ji girêbendên gundên Kurdistanê yên hatibûne şewitandin pêk hatibû (Bnr. Bêcihûwarbûyîn, Çalakîya Ciwanan, Stenbol, 1996) û bi gelek berhemên xwe yên bi rengî, wek hunermendekî esilkurd, di der û dorên hunerê yên li Stenbolê de tûşî gelek êrîşan û rexneyan bûbû. Altindere ji binî heta serî *avangart* bû û fena hemû avangartan, li hemberî der û doreke hunerî ya neteweperest têkoşiya bû, lewre di nîveka salên 90'î de, heyberê hunera nûjen bi awayekî tundûtûj veguheztibû polîtîkayê, xasma jî li rewşa kurdan. Di destpêka salên 2000'an de jî, bi dû bajarên wek Stenbolê, Îzmîrê û Enqereyê, navê Diyarbekirê û hunermendên wê yên hevçax jî ku ji çend kesên li Zankoya Çukurovayê xwendibûn dihatin pê, hildidan ku ev yeka han, nîşaneya pêvajoyeke nû bû. Divê li vir bibêjim, wekî bandora Xelîl Altindereyî, formên wî yên hunerî û helwesta wî ya îronîk a li beramberî kevalperestiyê û kelepora hunera nûjen, rê li ber hunermendên kurd jî vekiribû. Hunermendên diyarbekirî,







mêrdînî û batmanî di gelek pêşengehên ku Altindere wek kurator ew li dar xistibûn de, bi berhemên xwe yên ewilîn derketibûn hafa hunerhezan. *Ekola Diyarbekirê, humermendên diyarbekirî, hunermendên esilkurd ên tirkîyeyî*, nav û etîketên ku di nivîsên rexneyî û katalogan de dihatin bikaranîn, wiha bûn… De baş e, çi bi avangartê hat? Deranên hunermenda almanî ya bi eslê xwe ve japonî *Hito Steyerlê* ye ku di nivîsara xwe ya bi sernavê *Huner Wek Mijûlayî: Pêşniyarên Derbareyî Xweserîtiya Jiyanê* de– ku li ser avangartên (pêşewayên) wekî Grindon û Kanngieserî nivîsiye– dibêje; "*Bi wateya xwe ya giştî huner, parçeyeke pergala global a newekhev e ku di hin herêmên cîhanê de lawaz (wek Kurdistanê, nîşeya min e) û di hin herêman de jî qewî pêşketî ye ku sînorên di navbera van herêman de awayekî ji awayan derbasî nav hev bûne û hev dibirin. Jê wêdetir huner, dev ji mijûlkirin û dagirkirina mirovan, mekanê û demê bernade, bi ser halan de jiyanê jî mijûl û dagir dike. Hêviya avangartan ew bû ku hunerê bi hêzeke şoreşgerane di nav jiyanê de geş bikin û belav bikin, lêbelê berevajiya vê yekê li dar ket; jiyan, ji aliyê hunerê ve hat dagirkirin, lewre nijdên destpêkê yên hunerê, her ku çûn veguheztin êrîşên ji rêzê û dû re jî dagirkirinên hertimî.*"

Tişta ku ez dibînim û vedibînim ev e, *avangart* têk çû, ango ya ku em pê dizanîn û me xwe pê gîro dikir. Hunermendên kurd jî, rizgarîya xwe di *'tirkbûyîna spî'* de dîtin; îcar ne hewce ye ku ji bo vê veguherînê hûn berê xwe bidin navendê, hûn dikarin vê yekê ji Diyarbekirê, ji Mêrdînê û ji Batmanê jî pêk bînin.

Gelo dê çi bi wê lîmûzînê bibe? Ku neçe mûzexaneyekê, heye ku Gerînendetîya Giştî Ya Ewlekarîyê wê bikire û di fûarên xwe de nîşan bide. Lê ne ya Elî Bozanî, ku di sala 2008'an de bi navê *Torosa Spî*, fotografekî dîjîtal çêkiribû; ew jî lîmûzîn bû û ji bo ku gelek kurdên din jî têxin hundirê wê û paşê ajara wan biqelînin, bi fen û fûteke fotoşopî hatibû dirêjkirin. Elî Bozan bi tenê berhemek afirandibû, belam gelek tişt jî destnîşan kiribûn.

Ji ber çi em li dû wateyine qewî kûr dikevin gava mijar tê ser hunera hevçax? Vê pirsê ji xwe bikin. Dîsan ji bo bibîrxistinê bibêjim, hunermendê diyarbekirî *Ahmet Ogut* jî, li *Merdiven Art Spaceyê* di vîdeoya xwe ya bi navê *The Mising T*'yê (T'ya Windabûyî) de bal kişandibû ser pirs û pirsgirêkên dijwar ên polîsên meksîkî. Nizanim bê ev hevkariya me ya bi polîsên cîhanê re ji çi û ji ku tê, yan hestiyariya me? Ji humanîzmê? Ne bawer im… li ku agirê gur, xwe dide wir, çîroka me ya hunerê ev e.

***1 - Halil Altindere, Kayiplar Ulkesiyle Dans, Yapi Kredi Yayinlari, 2008.***
***2 - Heman pirtûk.***
***3 - Meşgale Olarak Sanat: Hayatin Ozerkligine Dair Onermeler, Hito Steyerl, Kuresel Ayaklanmalar Çaginda Direniş ve Estetik, Aylin Kuryel, Begum Ozden Firat, İletişim Yay. 2015, r. 141***



**Bîlal Ata Aktaş**

## Shakespeare & Company

Şerê cîhanê yê yekem diqede, leskerên ji laş û ji dil birîndar berê xwe didin malên xwe. Bajarên li ber sekeratê hewl didin xwe derman bikin. Dinya alem cî diguhere, mîna tîcaretê, yekem şerê qerase yê tevahiya kosmosê jî çi qasî alemê ji hev dûr xistibe, ew qas jî nêzî hev dike. Bajarekî bi nezera çavên hinde bajar û bajarokan cardin qîmetê digire ser xwe. Parîs cardin dibe cihûwarê çand û hunerê.

Slyvia Beacha ya teze ji 30'î derbas bûyî piştî serencameke tevlihev li Parîsê bi cî dibe. Bi derdorên curbicur re têkilîyan datîne. Di encama vê ehd û cehdê de, sala 1919'an, bi navê Shakespeare & Company kitêbfiroşekê ava dike. Siftehî kitêbfiroş, lêbele bi demê re him dibe kitêbxane, him weşanxane him jî dîwana dost û hevalan. Dost û hevalên ku piştî şerê rê û rêwarên xwe winda kirine û tevde bûne endamên Nifşê Wendabûyî (Lost Generation). Hima bêje hemû tên li vir dicivin û bazara wêjevanîya îngilizîaxêvan geş dikin. Ernest Hemingway, F. Scott Fitzgerald, Ezra Pound, James Joyce kesên sereke ne di vê mêvanxaneya edebî de.

Bere bere ev der dibe motora hilberîna wêjeya bi îngilîzî li Parîsê. Ew çend ku cara ewil kitêba navdar a James Joyceyî, Ulysses bi saya wêrektîya xwedîya vê derê, S. Beachê, bi temamî tê çapkirin. Heya 1922'yan çend qismên wê di rojnameyên cihê de diweşin lê hege ji Beachê nebûya dibe ku bo demeke dirêj alema edebî yek ji kitebên herî sansasyonel a hemû deman bêpar bimaya.

Şerê cîhanê yê duyem wekî gelek war û wargehan rê li ber geşbûna jiyana edebî û çandî ya Parîsê jî digire û Shakespeare & Co ji ber zexta Nazîyan tê girtin. Heya 1951'î ti cihek bi heman navê di pîyasê de tune. Ta ku amerîqîyekî din, George Whitmanî ev cih werdigire ser xwe û ar û armancên vê derê tevî xêr û xisletên wê pêş ve dibe. Ya ku vira birê ve dibe jî jixwe anha keça wî, Sylvia Whitman e.

Çawa ku Nifşê Wenda têra xwe sûd ji Shakespeare & Co wergirtibe, G. Whitman jî dixwaze Nifşê Beatê (Beat Generation) jî xwe ber bi vê kitêbfiroşîyê ve bikin. Loma bi qasî 30 nivînan li mekanê zêde dike û wê dizivirîne cihekî navendî ku wêjevan û xwîner tên û beranberî çend saet xebat û xwendina kitêban lê dimînin. Ji vê nifşê Beatê ku navê xwe ji otelekê nêzîkî kitêbfiroşê digire bi navên wek Henry Miller, Allen Ginsberg, William S. Burroughs, Anais Nin û Ray Bradbury derbas dibin.

Her ku diçe kitêbfiroş bala bêhtir kesan dikişîne. Rêya bi dehan fîlm û xebatên dîtbarî ji vir derbas dibe. Derheqê wê de mesel û çîrok tên gotin, ev der dibe wek îkoneke demên modern.

Digel vê yekê hê jî bedewîya xwe parastîye û mirov hê jî dikare qewşek aramîyê lê bibîne. Li qata yekê nivînek, li ya duyem jî du nivîn hene ku nivîskarên xwedî plan û proje bikaribin werin li vir razin.

Helbet wekî kevneşopîyek avakirina ciheyekî wiha, ji wê wêdetir, domdarîya mekanekî wilo, ne tenê girêdayî şexs û kesan e lêbelê ji strukturekê civakî û ji rihê demê dinizile. Parîs tevî mezinahîya xwe ya bi qasî Uskudar û Kadikoyê ji qedr û qîmeteke wilo feyz digire û bivê nevê bi awayekî li nav şaristanîya çîroka me bi cih dibe.

***Shakespeare and Company, 37 Rue de la Bûcherie, Parîs, France***



*Ji kitêba bi navê Shakespeare & Co wêneyek, r. 211*



*Dîmenek ji kitêbfiroşê, mijdar 2019*